
**Barê mezin** / Kaba yûk / Gross charge  
*Barê elektrostatîk yê mezin.*

**Bargegir::Kondensator** / Kondansatör::Kapasitör / Capacitor  
*Amûra elektronîkî ku barê elektrîkî li ser xwe kom dike.*

**Bargegirî** / Sîğa / Capacitance  
*Rêjeya şiyana (Tiwana) bargegir (kondensator) ek.*

**Bargeker** / Yûkleyici::Doldurucu / Charger  
*Amûra ku enerjîya elektrîkê li batarya, komker an jî bargegiran bar dike.*

**Barimte** / İpotek / Mortgage  
*Ji ber deynê misogerkirina (garantilemek) erd, xanî û hwd. ...*

**Barîsfer** / Barisfer / Barysphere  
*Yek jî tebeqeyê dinyayê ye.*

**Bariste** / Kütle / Mass  
*Mêjera madeyê ya heyberan.*

**Baristeya gerdîleyî::Baristeya Atomî** / Atomik kütle / Atomic mass  
*Cureyek baristeya ku madeyên biçûk pê têne pîvan. Mînak: 1 g=6,02214179 (30) x10<sup>23</sup> ba (baristeya atomî)*

**Baristeya Molarê** / Molar kütle / Molar mass  
*Di zanina kîmyayê de ji bo graniya atomên ku qasê jimareyê avogadroyê tê gotîn.*

**Barkirî** / Yüklü / Loaded  
*Yê ku bi bar e.*

**Barkirin** / Şarj etmek / Charging  
*Lê barkirina enerjîya elektrîkê. Mînak; barkirina li akûyê.*

**Barkirin** / Yükleme::Doldurma / Load  
*Lê barkirina enerjî yan jî baristeyê.*

**Barograf** / Barograf / Barograph  
*Alava ku pestoya hewayê dipîve û tomar dike.*

**Barometre::Barometre::Pestanpîv** / Basınçölçer::Barometre / Barometer  
*Amûra ku pestoya bayê (hewayê) dipîve.*

**Barpîv** / Yüklölçer / Coulometer  
*Amûra ku barê elektrîka statîk dipîve.*

**Barûd** / Barut / Gunpowder  
*Madeya ku di guleyan de ji bo teqînê tê bikaranîn.*

**Baryon** / Baryon / Baryon  
*Baryon ji atomê girantir û biçûktir e.*

**Baskê bergir** / Direnç kolu / Resistance arm  
*Di mekanîzmaya qerase (malêle) de navbera xala bar û xala destekê ye.*

**Baskê hêzê** / Kuwet kolu / Force arm  
*Di mekanîzmaya qerase (malêle) de navbera xala hêzê û xala destekê ye.*

**Baskûl** / Baskül / Bascule  
*Alava ku pê giranî pê tê wezinandin.*

**Bastêq** / Pestil / Membranedried fruit pulp  
*Şîrînahiyeke ku ji şîreya tirî çêdibe. Pîlora ku ji şîreyê çêdibe li ser rûyekî tê raxistin da ku hişk dibe û dibe bastêq.*

**Baştirîn** / Optimum / Optimum  
*Yê herî qenc. Çêtirîn.*

**Başûr** / Güney / South  
*Milê mirov ê çepê li rojhilat û milê mirov ê rastê li rojava binêre, ew aliyê ku berê mirov lê ye başûr e.*

**Bauhaus** / Bauhaus / Bauhaus  
*Zanîngeheke li Almanyayê. Dema ev zanîngehê tavakirin avahîsaz û hunermendên navdar lê dest bi xebatê dikin. Û nêrîna vê zanîngehê di warê avahîsazî û sêwirandinê de dibe wek ramanêke nû.*

**Bax::Baxçe::Rez** / Bağ:bahçe:mevye bahçesi / Orchard  
*Erdê ku tê de çandina tirî, fêkî, zerzewat û hwd. tê kirin.*

**Baxçe** / Bahçe / Garden  
*Erdê ku tê de çandina tirî, fêkî, zerzewat û hwd. tê kirin.*

**Bayt** / Bayt / Byte  
*Baytek 8 bît e, pîvana wateya bîrê ye.*

**Baz** / Baz / Base  
*Madeyên ku dema tevî asîdê dibin xwê çêdikin.*

**Baza Hêzdar::Baza bihêz** / Kuwvetli baz / Strong base  
*Baza ku di giraweya şilek de bi temamî iyonîze dibe.*

**Baza Qels::Baza lewaz** / Zayıf baz / Weak base  
*Baza ku di giraweya şilek de kêmtir iyonîze dibe.*

**Bazalt alkalî** / Alkali bazalt / Alkali basalt  
*Maddeyên bi mîneral ê di encama pişqîna kura-yêde derketine ser zemînê û paşî bûne hişkî*

**Bazar** / Piyasa / Market  
*Cihê ku firoşkaran hatinebal hev ji bo firotina mal û warên xwe.*

**Bazdan** / Koşmak / Run  
*Bi gavên lezgîn bi peş ve çûyîn.*

**Bazilika** / Büyük kilise / Basilica  
*Dêra ku hundirê wê bi 2 rêzên stûnan hatiye sê parkirin*

**Bazirgan::Tacir** / Tüccar::Tacir / Merchant  
*Kesê ku hem firoşkarî û hem jî kirkariya tiştan dike.*

**Bazirganî** / Ticaret / Trading  
*Ji karê kirin û firotinê re tê gotin.*

**Bêbandor** / Tesirsiz / Inefficient  
*Hêza ku li ser kesekî an tiştekî tunebe re tê gotin.*

**Bêber** / Verimsiz / Unproductive  
*1. Sûdgirtina kêma ku li gora jê tê hêvîkirin ber jê nayê girtin. 2. Kana ku rêjeya gewhera wê kêma e.*

**Bêdawî::Abadî** / Sonsuz / Infinite  
*Ji ber mezinbûn an biçûkbûna her awayî yê ku em nikarin bipîvin re tê gotin.*

**Bêder::Bênder**/Harman yerî/Threshing field  
*Ciyê ku genim, nîsk û noka kom dikin û ji hev diqetînin.*

**Bêgaz kirin** / Gazsızlaştırmak / Degas degaiseren  
*Jê derxistina gaza ku ji bo jiyana xebatkarên kanê xetere ye. Mînak; Bi alikariya bakêşê derxistina gaza metanê.*

**Bêgazkirin** / Gazsızlaştırma / Degasifying  
*Jê derxistina gaza ku ji bo jiyana xebatkarên kanê xetere ye. Mînak; Bi alikariya bakêşê derxistina gaza metanê.*

**Bêgrizû** / Grizusuz / Clear of gas  
*Tunebûna gazê di kanzaya komirê de.*

**Beher** / Beher / Beaker  
*Ji bo parastina şilekan tê bikaranîn. Ji cam, porselen û plastîkê tê çêkirin. Li dora wê dereceyên ku qebareya şilek nîşan dide heye.*

**Bêhevseng** / Dengesiz / Unbalanced  
*Rewş, xebat, tevger û hwd. Yê bêpergal.*

**Behîv** / Badem / Almond  
*Fêkiyeke ku qalîkê wê hişk û di nava qalîkê wê de kakilek yekpare heye. Berî ku baş bigihîje navê wê behîvter (geroh, gulh) e. Tehma hinek behîvan tehl e.*

**Bêhn** / Koku / Odor  
*Pirîskên (ên ku bandorê li ser pozê mirov dikin) biçûçik ku ji tiştan belav dibin.*

**Bêhn** / Koku / Smell  
*Bandora pirîskên biçûçik ku ji tiştan belav dibin û*

tûreyên (sînîr) pozê (bêvil, difin) mirov hişyar dike. Bêhna gulê, bêhna sosinê, bêhna sulfurê...

**Bejavî** / Amfibi / Amphibious

Ajalên ku hem di avê de hem jî li er zêviyê de dijî.

**Bejî** / Kuru::Kıraç::Yağış almayan / Moor  
Erdê bêav.

**Bêjîng::Moxil::Serrad** / Elek / Sieve  
Amurêk bo jehev veqetandina bujanan.

**Belav** / Tevzi / Distribution  
Karê parvekirinê ye.

**Belavker::Dîstrîbîtor**/Distribütör/Distributor  
Li gorî pegalekê di motorên bi benzîn de alavê ku karebayê li bûjiyan belav dike

**Beledî** / Şimşek / Lightning flash  
Ronahiya birûskê ye. Ronahiya ku bi valabûna barê elektrîkê di nava ewr û erdê yan ewr û ewrekê de dertê holê û wek xêzeke şikestî çîk dide.

**Belexwarî::Xwaromaro**/Egri bûgrû/Crooked  
Tişt, xêz an jî rêya ku çî bi çî xwar e. (ne rast)

**Belgemafa avadaniyê** / İmar çapı / Diameter of the zoning plan  
Belgeya ku li gor plana avadaniyê mafê avadaniyê nîşan dide.

**Belgemafa (eşkêl) veqetandinê** / Ayırma çapı / Diameter of separation  
Belgemafa (Eşkêl) veqetandinê a ku parên parselê nîşan dide. Parçeyek ji parselê ku bikeve ber plana avadaniyê ev parçe bi belgemafa (eşkêl) veqetandinê ji parçeyên din tê veqetandin, an ku li derveyê sînor tê hiştin.

**Belor::Şûşe** / Şişe / Bottle  
Derdanka ji bo şilavî têkevê ji camê an jî ji plastî hatiyê çêkirin. Bi teşeyê ji bin heta qirik fireh û ji destpêka qirik hetanî dev teng hatiyê çêkirin.

**Belot::Berû::Belû** / Meşe palamudu / Acorn  
Dara mazî yan jî tovên wê.

**Belûrîbûn::Kîrîstalbûn** / Kristalizasyon / Crystallization  
Pêvajoya derbasbûyîna teşeyê kîrîstala madeyên şilek, gaz an jî yên di nava twînerê de ne.

**Ben** / Damla sakız ağacı / Pistacia lentiscus l.  
Dara benîştokê

**Ben** / İp::Dikiş ipinden daha kalın / Rope  
Ji ta stûrtir lê ji werîs jî ziravtir û ji bo girêdanê tê bikaranîn.

**Bênav** / Adsız::İsimsiz / Anonymous  
Kes an jî tiştê ku nav lê nehatiye kirin.

**Bend** / Kısım / Section  
Ji her yekî peçeyên bitûn re te gotin.

**Bend::Berbest** / Set / Barrier  
Ji dîwêrê qalîn ku ji bo av neherike û kom bibe re tê gotin. Û ji diwêrên ku ji ber baranên zêde ax neherike hatiyê çêkirin re jî tê gotin.

**Benda deryayê** / Deniz seddi / Marine great wall  
Ji bo ku neminin bin ava deryayêde, cihên Li gor deryayê nizim bi seddekê, bi bendavekê, bi ber-bendekê tên parastin.

**Benda Hîdrojenê** / Hidrojen bağı / Hydrogen bond  
Girêdana ku di navbera atoma Hîdrojen û atomeke ku yek elektrona wê kêm e re çêdibe.

**Benda İyonîkê** / İyonik bağı / Ionic bond  
Cureyê benda kîmyewî ku di navbera iyonên bi awayê dijber barbûne çêdibe.

**Benda Kîmyewî** / Kimyasal bağı / Chemical bond  
Girêdanek ku du an jî zêdetir atoman bi hev ve datîne.

**Benda Kovalentê** / Kovalent bağı / Covalent bond  
Girêdanek ku bi parvekirina yek an jî zêdetir elektronan di navbera du atoman de çêdibe

**Benda Pî (π)** / Pî (π) bağı / Pi (π) bond  
Di navbera du atoman de du bend hebin yek benda sîgmayê, benda dinê jî ya pî ye

**Benda Sîgma (σ)** / Sigma (σ) bağı / Sigma (σ) bond  
Di navbera du atoman de girêdanek hebe ev jî benda sîgma ye.

**Bendav** / Baraj / Dam  
Avahiya ku ji bo avdana zevî û hilberîna elektrîkê avê li cîhekî kom dikin.

**Bendava axî::Axebendaw** / Toprak baraj / Earth dam  
Bendava ku bi axa avtênebihûrî hatiyê avakirin.

**Bendava betonî::Konkîrîtebendav** / Beton baraj / Concrete dam  
Bendava ku li ser zemîneke bi teht ji betonê hatiyê avakirin.

**Bendava bi axê dagirtî** / Dolgu baraj / Earth fill dam  
*Bendava ku bi kevirên gewre û bi axa avtênebi-hûrî hatiye avakirin.*

**Bendava bi keviran dagirtî::Bendava Berdrêj** / Kaya dolgu baraj / Rock fill dam  
*Bendava ku bi kevirên gewre û bi betonê hatiye avakirin.*

**Bendava bipayenda::Bendava bialpîşt** / Payandali baraj / Buttress dam  
*Bendava ku hîmê wê yan jî sîsika (dendik) wê bi palpiştiyekê hatiye piştgirî kirin.*

**Bendava dagirî** / Dolgu baraj / Fill dam  
*Bendava kû bi ax an jî bi kevirên tîjî kirin û paşî bi navgînê jidandinê tê jidandin.*

**Bendava kemerî** / Kemer baraj / Arch dam  
*Bendava kû hêz û giraniya ava bendavê bi saya kembera bendavê arasteyî quntara û derdorê dikê.*

**Bender** / Liman / Harbor  
*Di kersaxê deryayê de ciyê ku sekna keştî lê disekinin.*

**Bender::Bendergeh::Lengergeh** / Liman / Harbour:Harbor  
*Cihê ku keştî lê radiwestin. Rawestgeha keştiyan.*

**Bengele** / Makas / Truss  
*Kêranên ku ji hesin tîn çêkirin, ji bo hilgirtina banên hin avahiyên fireh (palûke, otogar). Dema firehî ji 30 m'yî dibihure ev kêran tîn bikaranîn. Ji cureyên profîlên hesinî (an jî pola) tîn çêkirin. Di banê avahiyên fireh ku kolonên wan hindik in mîna eywanên dawetê, avahiyên palûkeyan, pirên hesinî, xerac (otogar), avahiyên pîşesaziyê û hwd. de tîn bikaranîn.*

**Benîşte** / Damla sakızı / Mesteki  
*Bûjenên darê.*

**Benzîn** / Benzin / Gasoline  
*Ji petrolê çêdibe, teqla wê 0, 65, bê reng û fûrek e.*

**Benzînxane::Gazxane** / Benzin istasyonu / Gas station  
*Cihê firotina benzîn û gazê.*

**Bêqîmet::Bênirx** / Değersiz / Worthless  
*Yên ku bêfêde, bêkêr û negirîng e.*

**Bêr** / Kürek / Shovel  
*Amûreke karkeran.*

**Ber::Panî** / En / Width  
*Dirêjahiya navbera du xal an jî du rûxarên heyberekî. Di lakêşe de layê (kenarê) kin.*

**Berahiya pêlê::Firehiya pêlê** / Dalga genliği / Amplitude of wave  
*Navbera bilindtirîn xala pêlê û sifirê (eksen). Bilindahiya pêlê.*

**Beran** / Koç / Ram  
*Mêşina (Mî) nêr.*

**Beravêtin::Ber avêtin** / Yavru atmak::Düşük yapmak / Miscarry  
*Ji bo ajalan bûyîna têtîkên mirî. Heke ajalek berî ku bizê têtîka wê di zikê wê de bimire ji wê ajalê re dibêjin "beravêtî ye".*

**Berbang** / Tan / Daylight  
*Ji demê beriya ku roj derdikeve re tê gotin. Di wê demê de ronîbûn dest pê kiriye. Ronahiya berî şefeqê.*

**Berbank** / Teras / Terrace  
*Qada (beş) derve ya ku tê bikaranîn a avahiyekê ku ji erdê bilindtir e. Bi gelemperî di avahiyên de li tebeqeya bilindtirîn tê çêkirin.*

**Berbes** / Mineral / Mineral  
*Tîştên ku madeyên îrganîk dihundurîne.*

**Berçavik** / Koruma gözlüğü / Goggles  
*Berçavka ku ji bo çav biparêze tê bikaranîn.*

**Berçavk** / Cözlük / Glasses  
*Ji bona parastin û başdîtinê alava ku li ber çavan tê bikaranîn*

**Berdana kêlekî** / Yan çekme / Side towing distance  
*Çêkirina avahiyekê lîser parselêde, direjahiya valahi hiştinê ya li herdu rexan. Direjaiya Valahi hiştina ji bilî alên pêş û paş.*

**Berdana pêş** / Önçekme / Front towing distance  
*Çêkirina avahiyekê lîser parselêde, direjahiya valahi hiştinê ya pêş (ber, aliyê rê, anji aliyê rêya fireh)*

**Berdêla îstîmlaqê** / Kamulaştırma bedeli / Expropriation price  
*Berdêla ku cih û avahiyên ji bo berjewendiyê civakê ji aliyên dezgehên dewletê ve tê kirîn.*

**Berdewamî** / Süreklilik / Continuity  
*Tîştê domdar.*

**Berê** / Önce / Before  
*Wexta ku derbas bûye.*

**Bêrehend** / Boyutsuz / Impartial  
*Rewşa ku dirêjahî, bilindahî an jî firehî nîn e.*  
*Mînak: xal*

**Bêreng** / Rensiz / Achromic  
*Tîştêkî ku rengê wî tune ye.*

**Berevaniya avê** / Su koruma / Water conservation  
*Avherkên kû ji bo karê avdana zeviya avê ji çavkaniya dibine ser zeviya.*

**Berfîn** / Kardelen / Snowdrop  
*Cureyekî kulîlkan e. Li çiya û zozanan bi destpêka biharê re ku berf dihele hêşîn dibe. Di bin berfê de hêşîn dibe, dema roj lê dide hişk dibe.*

**Bergegirî** / Sürekli mukavemet / Durability  
*Rewşa xwegirtina li hemberî teka (karîgerî) kîmyayî, fizîkî û mekanîkî. Xwegirtina li dijî guhertinan.*

**Bergir** / Direnç / Resistance  
*Yekeya wê ohm e. Amûreke kêmgihîner e. Li gora hêza xwe tezûya (herk) elektrîkê kêmkê dibe.*

**Bergira guherbar** / Ayarlı direnç: Reosta / Variable resistance  
*Bergira ku guherîna wê pêkan e.*

**Bergirên hevrêk::Bergirên hawrêk::Bergirên terîbî**  
*/ Paralel dirençler / Resistors in parallel: Parallel resistors*  
*Di vedorê (circuit) de bergirên li kêleka hev in. Seriyê bergirê bi seriyê bergira din ve, dawîya bergirê jî bi dawîya bergira din ve tê girêdan.*

**Bergirî** / Mukavemet / Resistance  
*Tirûşa (rezîstans) ku li hemberî hêzên derve ji bo parastina taybetmendî û şeweyê xwe tê nîşandan. Di heman erdhejê de bergiriya avahiyên ku hilnawêşin ji bergiriya avahiyên ku hildawêşin zêdetir e.*

**Bergiriya erdhêjê::Bergiriya bûmelerzê** / Deprem dayanımı / Earthquake resistance  
*Pîleya barhiligiriya avahiyê ya li hemberî bûmelerzê.*

**Berguhk** / Kulaklık / Earphone  
*Amûra ku dikeve hundirê guh û deng jê tê.*

**Berhema paşîn::Diwaberhem** / Nihai ürün / Finished product

*Gewhera ku lê tê gerîn û di dawîya veqetandinê de bi dest dikeve.*

**Berhevkar::Komker** / Derleyici / Compiler  
*Ew ê ku hîlbjartî dibe û dide hev.*

**Berhilanîn::Berûbûm** / Ürün / Harvest  
*Hilberînen zevî, bax û baxçeyan.*

**Berhilanîn::Çandin::Palehî** / Hasat: Ürün almak / Harvest  
*Daneheva zad, fêkî û hemû berên çandiniyê.*

**Berîlyûm** / Berilyum / Beryllium  
*elementa di tabloya peryodîkde a li stûna 2A. elementeke kû kêmkê tê dîtin e. Bi kurteya "Be" tê nîvîsandin.*

**Berjêr::Nişov** / Yokuş aşağı / Downhill  
*Rêya ku mirov lê diçe û berê mirov li aliyê rê yê jêrîn be, ya jî serejêr be.*

**Berkaş::Rempa::Riyêlêj** / Rampa / Ramp  
*Hevraz. Qiyame. Riya hevraz. Riya ku di domahiya xwe de bilind dibe.*

**Berkeliyûm** / Berkelyum / Berkelium  
*Elementa ku hatiye çêkirin û nimreya wê ya atomê 97 û graniya wê jî 294 e.*

**Bêrm** / Suyun toplandığı yer / Watering hole  
*Gola ku av tê de dicive.*

**Bermal** / Taban: Kat / Floor  
*Di hundir de zemîn, asta herî nizm a cihêkî ser girtî.*

**Bermayî::Jêmayî** / Artık / Residual: gob  
*Madeyên di veqetandina gewherê de bi kêr nayên û tene avêtin.*

**Bername** / Program / Programme  
*Pakêta kodan a nivîsbariyê ku ji bo peywirekî hatiye amadekirin. Fermandeyên ji bo kompîterê. Erkdariyên pêdiviya kompîterê.*

**Berpar::Dabeşkiraw::Dabeşkirî** / Bölünen  
*Divided::Divisible / Jimara ku tê dabeşkirin.*

**Bersem kirin** / İfraz / Subdivision  
*Li gora plana îmarê an jî ne li gora plana îmarê dabeşkirina erd.*

**Bersivdan** / Yanıtlamak / Answer (to)  
*Li hemberî pirsêkê axaftina der barê wê pirsê de.*

**Bertek::Kartiyaker::Reaktans** / Tepki / Reactance  
*Bersivdana ji bo bûyereke fizîkî, reaktans.*

**Berx** / Kuzu / Sheep

*Têjika (çêlik, fexik) mêşinê (mih).*

**Berxwedêrî** / Dayanim / Strength:Resistance

*Taybetiya berteka li hemberî hêza derve. Xweparastina li hemberî rewşê.*

**Berzefîn** / Lavanta çiçeği / Lavandula angustifolia

*Rengen kulîlkên wî binevşî û şî n e. Kulîlkên wî di pîşesaziyêde tê xebitandin.*

**Beş** / Sektör / Sector

*Komên ku heman karî dikin.*

**Beş::Bend** / Bölüm / Chapter

*Yek ji parçeyên ku tevahiyê pêk tînin.*

**Beş::Pişk** / Bölme / Partition

*Parçekirin û ji hev qetandina heyberekê.*

**Beşa serbixwe** / Bağımsiz bölüm / Independent section

*Di avahiyê de mulkiyeta her beşekê (daireyek). Heke di tapoya parselê de li gor plan û projeyê îrtifaq an jî mulkiyeta tayê hatibe çêkirin, wê demê mulkiyeta her beşê, her daireyê xwesere, serbixwe ye.*

**Bet** / Yabani hindi / Meleagris gallopavo

*Elokên kovî.*

**Beta** / Beta / Beta

*Tîpa duyemîn a alfabe ya yewnî ye.*

**Betal** / Boşta / Idle

*Yê/a ku naxebite.*

**Betal** / İptal / Cancel

*Rawestandin. Sekinandina kar.*

**Betatron** / Betatron:elektron hızlandırıcısı / Betatron

*Amûra ku elektronan dilezîne.*

**Bêtêl** / Telsiz / Wireless

*Şandina sîgnalan bi alîkariya pêlên elektromagnetîk. Di vî karî de têt (raguhêzbar) nayê bikaranîn.*

**Betirpêrar** / Üç yıl önce / Three years ago

*3 (Sê) sal berê.*

**Betlaneya dewrî** / Devre tatil / Time share vacation

*Mafê bânvedanê ji bo demek bi sînor kirî. Di dewre mulkêde tapo lazim e, lê di dewre betlaneyê de ne tapo lê tenê ji bo wexteke kin mafê bânvedanê ye.*

**Beton** / Beton / Concrete

*Bi tevdana çîmento, xîz, xîçik û avê çêdibe. Piştî çend demjimêran hişk dibe. Li gora bergiriya betonê rêjeya van madeyan diguhere.*

**Betona amade** / Hazır beton / Ready-mixed concrete

*Betona li santralê tê amedekirin û di lêkirina avahiyên de tê bikaranîn.*

**Betona bi baryûm** / Baryumlu beton / Barytes concrete

*Betona ku Baryûm tê de heye. Bi giranî xîz û xîçê wî ji baryûmê pêk tê.*

**Betona şîşbendkirî::Betonarme** / Betonarme / Reinforced concrete

*Betona ku bi şîşên pola tê zeximkirin da ku li hemberî erdhej û giraniya xwe neşikê. Betonarme di hemû avahiyên de tê bikaranîn.*

**Bexçe::Bostan::Werz::Parêz** / Bostan / Vegetable garden

*Cihê zebze tê çandin.*

**Bexdenûs** / Maydanoz / Parsley

*Giyayekî wek biharatê tê bikaranîn.*

**Beyar** / İşlenmemiş toprak:Sürülmeyen yer / Raw land

*Axa ku lê çandinî nehatiye kirin.*

**Beybûn** / Papatya / Daisy

*Kulîlkeke bibêhn.*

**Beytar** / Baytar / Veterinarian

*Bijîşkê/a ajalan.*

**Bi ser rê ve berdayî** / Yola terk / Leave off

*Parselasyonêde beşa erdê ya rasti rê tê, ya dikeve ber rê di tapuya wê de aqara wê tê kêmkirin. Ev beş ji bo rê, bêbedel tê terkkirin, ji aliyê xwedive.*

**Bibîne** / Bul / Find

*Di zanistiya kompîturê de, peyva ku bigire û bigere.*

**Bichanîna zorî** / Cebri icra / Foreclosure

*Bichanîna biryara dadgehê. Bichanîna darê zorê.*

**Biçûk** / Küçük:Ufak / Small

*Di pîvanê de ya kêm. Bi çewanî, nîrx an jî bi dîmenê xwe kêmtir.*

**Biçûkkirin** / Küçültme / Minimize

*Ji aliyê mêjerê ve kêmkirin.*

**Biçûktirîn::Mînmûm::Kêmtirîn** / Minimum / Minimum

*Guhêbara ku bi nirxa xwe di sînorê herî binî (nizim) de. Dijberê maksîmûmê ye.*

**Bide ber hev::Daneberhev::Berhevdan::Berawird** / Karşılaştırmak / Compare (to)  
*Ji aliyê mējera wan ve lēkolîna tiştan an jî di nav xwe de danîna berhev.*

**Bidest ::Manuel** / El ile / Manual  
*Tiştê ku bi destan hatiye çêkirin.*

**Bidestxistin** / Kazanmak: Ede etmek / Acquire (to)  
*Bi saya tēkoşîn an jî xîretê wergirtina tiştêkî.*

**Bidomîne** / Devam: Tekrarlamak / Resume  
*Fermana domandina karê ku berê dest pê kiribe, da ku bidome.*

**Bidomîne::Berdewam** / Devam / Continue  
*Ji bo encamgirtinê meşandina kar an jî kirariyekê.*

**Bigire** / Kapat / Close  
*Fermana girtina bername an jî pergalê.*

**Biha** / Fiyat / Price  
*Rayîşa tiştê ku tê kirîn.*

**Bihevvedanîn** / Birleştirmek / Merge  
*Pêvekirina herî kêma du heyberên cuda.*

**Bihîstinî** / İşitirlik / Audibility  
*Çawaniya dengê ku tê bihîstin.*

**Bihur::Bihûrek::Derbasok** / Geçit / Passage  
*Cihê ku bi kêrî çûndinê tê.*

**Bihurek::Derbasgeh::Derwaze** / Geçit / Gate  
*Ew xala diyar ku di nava du ciyan de ye û rê tê de diçe.*

**Bihurîna demê::Demborîn** / Zaman aşımı::Süre aşımı / Time-out  
*Derbasbuiyina dem. Mafek an jî serlêdanek lazime heya mējuyekê bê bikaranin, Qediya dema hati diyarkiri. piştî serederbasbuiyina demê maf nikare bê bikaranin.*

**Bijarte** / İşaret / Bookmark  
*Nîşankirin. Hilbijartin.*

**Bikaranîna avê** / Su kullanımı / Water use  
*Rêbaza bikaranîna avê.*

**Bikaranîna erd** / Arazi kullanımı / Land use  
*Ji bo armancên cur be cur xebata li ser erd.*

**Bikarbon** / Karbonlu / Carbonaceous  
*Tiştê ku di binemaliya wê de karbon heye.*

**Bikarhêner** / Kullanıcı / User  
*Mirovê ku karinan dike.*

**Bikartûş** / Fonksiyon tuşları / Function keys  
*Tûşên kilavveyê ye ku hinek fonksiyonên nû pê çêdibin.*

**Bibil** / Bülbül / Nightingale  
*Çûke ku her dem dixwîne. Bi dengxweşiya xwe tê nasîn, dirêjahiya wê nêzî 16 cm'yan e.*

**Bilind** / Yüksek / High  
*Tiştê ku qama wî pir dirêj be.*

**Bilindahiya reş::Qota reş** / Siyah kot / Black level  
*Asta bilindahiya ji deryayê ya cihên xwezayî. Bilindahiya cihê destwerdan lê nehatîkirin, nehatiye kolan û nehatiye dagirtin.*

**Bilindahiya sor::Qota sor** / Kırmızı kot / Red level  
*Asta bilindahiyaku di projeyê de hatiye destnîşankirin.*

**Bilindahiya ta (kat) yê** / Kat yüksekliği / Storey height  
*Bilindahiya navbera zemîn û qatî.*

**Bilindgo** / Hoparlör / Loudspeaker  
*Amûra elektronîkî ku deng jê dertê. Amûra ku dengê televizyon an jî radyoyê jê tê.*

**Bilindpîv::Altîmetre** / Yükseklik ölçer / Altimeter  
*Amûra ku bilindahiyê li gora asta pestoyê dipîve.*

**Bilindker** / Yükseltgen / Oxidizer  
*Bûvera ku ji maddekî elektron were dayîn.*

**Bilindker::Amplifikator** / Yükselteç / Amplifier  
*Amûra elektronîkî ku sînyala deng, ronahî an jî elektrîkê bilindtir dike.*

**Bimesîne::Bixebitîne** / Çalıştır / Run  
*Fermana destpêkirina kar.*

**Binbar** / Yük altında / Under load  
*Ew tiştê ku di bin giraniyê de ye.*

**Binbihurk::Jêrbihurk** / Altgeçit / Underpass  
*Riyekî kû bin riyekîdinde diçe*

**Bindawêr** / Alt simge / Subscript  
*Sembola li jêr.*

**Bindeq** / Fındık / Hazelnut  
*Fêkiyeke ku qalîkê wê hişk û di nava wê de kaki-*

*lekî gilover heyê. Tovê dara bindeqê ye. Ev tov di gelek marmelatan de tê bikaranîn. Li herêma Hî-zana Bedîsê jî digihîje.*

**Binderya::Jêrderya** / Denizaltı / Under sea::Submarine  
*Qada ku li binê deryayê ye.*

**Binêre** / Bak / Look  
*Bi çavên xwe lê mêze bike.*

**Binesazî::Jêrsazî** / Alt yapı / Substructure  
*Karên bingehîn ku ji bo avahiyekê pêwîst e, mîna rê, xeta kêzînê, telefon, elektrîk, av, gaza xwezayî û hwd.*

**Bingeha civakî** / Sosyal altyapi / Social infrastructure  
*Saziyên weke dibistan, pirtukxane hwd. ji bo xizmeta gel hatiye avakirin.*

**Binkom** / Altküme / Subset  
*Di matematîkê de, komeke biçûk di bin koma mezin de.*

**Binrûbar::Binzê::Jêrûbar::Jêrzê** / Nehir yatağı / River bed  
*Rêya ku rûbar tê de diherike.*

**Binwaşê (avahî) :: Binistir (xaniyên axî) :: Binaxe :: Hîm :: Bingeh :: Bin** / Temel / Basic  
*Hêmaneke avahiyê ye ku giraniya avahiyê rasterast digire ser xwe û li zemîna binê xwe belav dike.*

**Binxêz bike** / Altını çiz / Underline  
*Fermana ku di kompîterê de ji bo binê nivîsê were xêzkirin tê bikaranîn.*

**Binzemîn::Binax** / Yeraltı / Underground  
*Binerd. Binê erdê.*

**Bipejirîne** / Kabul etmek / Accept  
*Fermana ku di nivîsbariyê de wateya wê qebûl-kirin e.*

**Biqedeme::Piledar** / Aşamalı / Gradual  
*Rewşa dem, cî an jî rewşa ku bi awayê gav bi gav diguhere.*

**Bîr::Bîrdank** / Hafıza:bellek / Memory  
*Cih an jî amûra ku agahî tê de tomarkirî ne.*

**Bîr::Sîba** / Kuyu / Well  
*Ji bo deranîna av an jî nefta binzemînê çala ku tê kolan.*

**Bîra** / Bira / Beer  
*Vexwarina bi alkol. Ji cehî tê çêkirin.*

**Bîra arasteyî** / Yönlü kuyu / Directional well  
*Bîra ku di dema bîrkolîyê de ji ber sedemêke diyar berê wê neşaqolî dibe.*

**Bîra deranînê::Bîra hilkêşanê** / Nakliyat kuyusu / Haulage pit (well)  
*Bîra asoyî ku ji ruyê erdê heta binê kanê tê çêkirin. Ev bîr ji bo derxistina maden, kerese û xebatkaran tê bikaranîn.*

**Bîra kûr::Sîba kûr** / Derin kuyu / Deep well  
*Bîra bi bîrkolê (sondaj) kûr hatiye kolandin.*

**Bîra kutanî** / Çakma kuyu / Drop-shaft:open caisson  
*Lûleya ku ji bo daxistina asta ava jêzemînê tê bikaranîn. Li dora çala esasê avahiyê tê raxistin. Dirêjahiya wî di navbera 0, 5-1 metre ye.*

**Bîrc::Tawir** / Kule / Tower  
*Avahiyên bi piranî gilover an jî çargoşeyî yê bi-lind. Asasê vê avahiyê zêde fireh nîn e.*

**Bîrca erdkolî::Tawira erdkolî** / Sondaj kulesi / Drill tower  
*Avahiya ku amûr û makîneyên erdkolîyê li ser in.*

**Bîrdanka parvekirî** / Paylaşımlı hafıza / Shared memory  
*Bîrdanka ku kompîterên din jî dikarin xwe bigihînin.*

**Bîrek** / Kesici / Cutter  
*Amûra ku ji bo birînê tê bikaranîn.*

**Bîrêkûpêk::Biserûber** / Düzenli / Regular  
*Ê ku bipergal e. Ê ku di cî de ye.*

**Bîrêvebirina zeviyê (erd)** / Arazi yönetimi / Land management:land administration  
*Kargerîya zeviyê.*

**Bîrinc :: Riz** / Piriç / Rice  
*ji malbata genim tê, dinav avêde çandiniya wî tê kirin.*

**Bîriqîn :: Teyisîn** / Parlamak / Shine  
*Ronîdan. Bîriqandina ronahiya ku ji jêderekê tê.*

**Bîrqonek::Bîrîqedar::Teyîsî::Wirşe**/Parlak/Bright  
*Yê/a ku şewq dide. Rûyê ku ronahiyê dibîriqîne.*

**Bîrîn** / Kesme / Cutting  
*Jêkirin. Qetkîrîn. Qutkîrîn.*



**Birûsk** / Yıldırım / Thunderbolt  
*Valabûna barê elektrîkê di nava ewr û erdê de ye.*

**Biryara îstîmlakê** / Kamulaştırma kararı / Decision of expropriation  
*Biryara ji aliyê saziya bi destûr ve ji bo berjewendiyên giştî kirîn erd, avahî û hwd.*

**Bîst** / Yirmi / Twenty  
*Navê hejmarekê ye. Hejmara piştî nozdeh e. Navê hejmara 20, an jî di jimareya Romayî de XX.*

**Bîst û yek** / Yirmi bir / Twenty one  
*Navê hejmarekê ye. Hejmara piştî bîst e. Navê hejmara 21, an jî di jimareya Romayî de XXI.*

**Bişkok** / Buton / Button  
*Bişkoka ku ji bo xebitandinê tê bikaranîn.*

**Bişkok** / Dügme / Key  
*Amûra ku ji bo tezûya elektrîkê vedike û digire. Bi gelemperî ji bo vekirin û girtinê tê bikaranîn.*

**Bişkoka elektrîkê** / Elektrik düğmesi / Electric switch  
*Bişkoka ku tezû (herk) ya elektrîkê vedike û digire.*

**Bivir** / Balta / Axe  
*Alava ku ji bo birîna daran tê bikaranîn.*

**Bixebitîne** / Çalıştır / Execute  
*Fermana ji bo destpêkirina karê sazîkirinê.*

**Bixêrî::pixêrî** / Şömine / Fireplace:Grate  
*Argûnên ku bi piranî li ber dîwaran ji xîşt an jî ji kevîran ji bo germkirina hundirê odeyan tên çêkirin.*

**Bixwevehatina (geşadana) berdewamî** / Sürdürülebilir kalkınma / Sustainable development  
*Parastina xwezayê ye. Armanca yekem di geşadana berdewamî de parastina xwezayê ye ji bilî vê jî peşdeçûna aborî û civakî armancên girîng in.*

**Biyokîmya** / Biyokimya / Biochemistry  
*Beşa kîmyayê ku li ser kîmyaya zindewariyan dixebite.*

**Biyolojî::Zîndewarî** / Biyoloji / Biology  
*Zanistîya ku jêderk, belavî, peresendî, avahî, mezinbûn û zêdebûna rehek u ajalan lêkolîndike*

**Biyotîf** / Biotit / Biotite  
*(K (Mg, Fe) 3AlSi3O10 (F, OH) 2),*

**Bizin** / Keçi / Nanny goat

*Ajaleke kedî ye, bi taybetî li herêmên çiyayî dijîn. Bêtir pelên daran dixwin.*

**Bizivîrîne** / Çevir / Rotate  
*Vegeandina li dora navendê.*

**Blokaj** / Blokaj / Blockage  
*Sekinandina tevgera karekî ya ji ber pirsgirêkekî.*

**Bombeya Atomê::Bombeya gerdîleyê** / Atom bombası / Atomic bomb  
*Bombeya ku ji perçêkirina dendikên atomê û ji encama wê enerjî derdikeve holê.*

**Bombeya Gazê** / Gaz bombası / Gas bomb  
*Bombeya ku di nava xwe de gazên ji bo zindiyan xeter dihewîne.*

**Boranxane** / Güvençinlik / Pigeon loft  
*Avahiya ku kevok tê de tên xwedîkirin, lîsê kevo-kan.*

**Boxesang::Gire** / Cendere / Clamp  
*Amûreke guvaştinê, bi taybetî jî ji bo guvaştina tirî tê bikaranîn.*

**Boyax** / Boya / Colour  
*Madeya ku reng dide heyberan.*

**Buhaya bilêvkirî** / Beyan değeri / Declared value  
*Nirxê ku ji aliyê xwediyê mulkê ve hatê gotin.*

**Bûkanî** / Gelinçik / Poppy  
*Kulîlkek.*

**Bûkaniya tibbî** / Tibbi gelinçik / Papaver bracteam lindi  
*Cûreyek bûkaniya ku di bijîkîda tê bikaranîn.*

**Bûlwar** / Bulvar / Avenue  
*Riya fireh a ku di nava bajêr de wek du beşan çêdibe (çûn û hatin) û navbera her du beşan (refûj) bi daran xemilandî ye.*

**Bungalov::Xaniyên yek kat** / Bungalov/Bungalow  
*Xaniyên li Hîndîstanê ên ku bi piranî yek kat in û darîn in.*

**Bûtik::Bişkoj::Çiro** / Tomurcuk / Fruit-bud  
*Zîlên ku di guliyên rehekan de derdikevin û di demeke kin de jê şax, gul û kulîlk çêdibe.*

**Bûyera navendrevî** / Merkezkaç olayı / Centrifuge  
*Bi bandora zivirînê hêzek ku berê wê li dijî navendê ye çêdibe ye.*



**Cam** / Cam / Glass

*Ji bo avahî ronî bibe li pencereyan (şibake) dikeve.*

**Cama ximamî** / Buzlu cam / Depolished glass

*Cama ku zelaliya wê jê hatiye birin.*

**Car::Caran** / Çarpî (işlemede okunurken) / Times

*Nîşana lêkdanê (x). Nîşana nava du jimarên ku li hev tên lêkdan. Mînak; (3x5) 3 caran 5*

**Carîn::Encama lêkdanê** / Çarpım (sonuç olarak çarpım) / Product

*Hejmara ku di encama lêkdana hejmaran de tê ditin.*

**Cawbir::Qeyçî::Qêçî::Meqes** / Makas / Truss (scissors)

*1. Alavek ji bo birîna heyberan 2. Di banên avahiyana an jî di piran de kereseyên ji bo belavkirina barê giraniyê.*

**Cax** / Korkuluk / Railing

*Li hemberî metirsiya ketina ji ciyekî bilind çêkirina bedekî ya ji çêkirina şêt.*

**Cax** / Merdiven korkuluğu / Balustrade

*Ji bo parastin û astengkirina ketinê tê bikaranîn. Li kêlaka derence û li kêleka şaneşnanê tê bikaranîn.*

**Caxika dirîşt** / Kaba Izgara / Coarse grid

*Caxika ku ji şivên hesinî hatiye çêkirin û ji bo ku parçeyên gir yê nav aravê veqetî nê tê bikaranîn.*

**Cazîbe** / Cazibe / Attraction

*Ji ciyekî bilind şilekî ber bi aliyê jêrîn ve xwe-bixwe biherike.*

**Cd** / Cd / Compact disk:CD

*Amureke gilover a ku dane li ser tê nivîsandin û tê xwendin. Di kompîturê de tê bikaranîn. Kurtkirina peyva "Compact Disk" e.*

**CD-ger**/Cd sürücü:cd okuyucu/Cd driver:cd reader

*Parçeyek ji kompîturê ku CD pê tê xwendin û bikaranîn.*

**Ce::Ceh** / Arpa / Barley

*Giyayek ji famîlyeya genim.*

**Cebîr** / Cebir / Algebra

*Karê hesabkirin û muhasebekirinê.*

**Cehnî::Canî** / Tay (at yavrusu) / Foal

*Çêlikê/a mehnê.*

**Cehtirî** / Taşkesen otu / Lithospermum arvense l.

*Giyayek peliwihişke, bigoşte, u bi pirçe, kulîlkên wî di bin çenge pelande derdikeve.*

**Cehtirî::Catre::Anûx** / Kekik / Thyme

*Cureyekî giyayên aromatik û tibî.*

**Cemed::Qerîse** / Buz / Ice

*Ava ku ji sermanan dibe qeşa.*

**Cemser** / Kutup:Ucay / Pole

*1. Xalek ji xalên bi voltajên dijberên hev in ku te-zûya (herk) elektrîkê çêdike. 2. Yek ji yênan ku dijberên hev in. Mînak; xala herî bakûr a cîhanê, xala herî başûr a cîhanê. Di mugnatîsê de aliyê Nûs*

**Cemsergirî** / Düzlemsel ucaylanım:kutuplanma / Polarization

*Lihevciwîna barên elektrîkî li cemseran.*

**Cemserî** / Kutupsal / Polar

*Tîştê ku bi cemserê re têkildar e.*

**Cer** / Vida / Screw

*Bizmarê ku bi zivirandinê bi cih dibe.*

**Cera girêdana alavê** / Alet bağlama vidasi / Screw fastening instrument

*Cera girêdanê a ji bo alav nelive, nezivire.*

**Cerbader::Dernefis** / Tornavida / Screwdriver  
Alava ku cerê dizivirîne.

**Cercere** / Çkrik / Spinning wheel  
Maşîna ji bo hilkişandinê ku werîs (anjî ben) li dora xwe dilefîne.

**Cercere** / Harman döven / Thresher  
Kes an Amûrê ku neqandina ka û tove dike.

**Cêwîkenar::Dula yeksan** / İkizkenar / Isosceles  
Sêgoşeya ku du goşeyên wê yeksanin û ew kêle-kên ji van goşeyan dirêj dibin jî yeksanin.

**Cewrik** / Enik:köpek yavrusu / Puppy  
Çêlikê/a dêlikê.

**Çiguhestina arîmetîk::Çiguhêrîna arîmetîk** /  
Aritmetik kaydîrma / Arithmetic shift  
Şemitandina bi aliyê rastê an jî çepê ve ya sinyalê.

**Çih::Ç** / Yer / Place  
Pozîsyon.

**Çihan::Zemîn::Erd** / Yer küre / Earth  
Çîhan

**Çihê bêhnvedanê** / Dinlenme yeri / Resting place  
Di plana avadaniyê de cihê ku mirov lê dişekinin, tèn cem hev, bêhna xwe vedikin. Minak:Park

**Çihêbûn** / Ayrışma / Fission  
Ji hev veqetandina madeyan.

**Çiguhêrîn** / Ötelemek / Shifting  
1. Di sinyalê de derengxistina ji bo demeke ne diyar. 2. Pêş an jî paş ve birin.

**Çils::Çêç** / Alq / Plaster  
Cureyekî kevirê spî ye. Formûla wî  $CaSO_4 \cdot 1/2H_2O$  e. Kevirê ciisê ku di agir de bê şewitandin û paşê li aşê kevirîn bê hêrandin dibe çils. Di karê avahiyên de tê bikaranîn.

**Çişogeh** / Çamaşırhane / Laundry  
Ji cihê ku kincên qiraj û lewûtî lê ne re tê gotin. Cihê ku kincên lewûtî û qirajî lê tê şuştin.

**Çişok::Çişor** / Çamaşır makinesi / Washing machine  
Makîneya ku cilan dişo û paqij dike.

**Çiqanek** / Kursak:Kanatlıların besinleri depo ettikleri midenin bir bölümü / Crop  
Di çûkande lebat a liser kirkiroke ye û hemû xwarin u vexwarin lê komdibe an dicive.

**Çirî::Nermî** / Esneklik / Flexibility:Elasticity  
Taybetiya heyberê ya ku bi hêzê şêwe diguherîne û dema hêz radibe vediguhere rewşa xwe ya berê.

**Çirn / Kurna** / Basin of a bath  
Cihê ku av tê dagirtin da ku pişt re were bikara-

nîn. Di serşoyê de cihê ku av dikevê di serşuştinê tê bikaranîn.

**Conega** / Boğa / Bull  
Gayê tov e. Ji bo hilgirtina dolê tê bikaranîn. Ji goştê wî jî sût tê wergirtin.

**Conî** / Dîbek / Mortar  
Kevirê ku çalek tê de hatiye çêkirin û ji bo genim, çiltûk û wekîdin tê de tene kutan.

**Conta** / Conta / Gasket  
Kereseyê ku ji bo madeyên şilek neçirizin tê bikaranîn. Di piston an jî borîyan de tê bikaranîn.

**Cot tikandin** / Çift tıklamak / Double-clicking  
Bi parçeyê kompîterê yê bi navê mişk tikandina du carî.

**Cotmetal** / Çiftmetal / Bimetal  
Parçeyên metal ên ku ji hev cuda ne û ji bo çêkirina termostatê li ser piştê hev tene rûniştandin.

**Coulomb::Kolomb::Yekeya barê elektrîkê** / Coulomb:Kulomb:Elektrik yük birimi / Coulomb  
Yekeya barê elektrîkê coulomb e. Barê 1 Amper elektrîkê ku di 1 saniyekê de li ser gihînerê diherike. "C = A x s"

**Ctrl** / Ctrl / Ctrl  
Kontrolkirin. Kurteya peyva "control" e.

**Cûbir** / Danaburnu / Mole cricket / Kêzik a rahê  
Rehek'an dixwe.

**Cuda Hilgire::Cuda tomar bike** / Farklı kaydet / Save as  
Di kompîturê de belge yan jî dosyayên ku xebat li ser wan tê kirin bi navekî din an jî li cihekî din bê qeydkirin (tomarkirin).

**Cuda::Cihê::Ciyawaz** / Farklı / Different  
Ne wekhevî. Ne yeksanî.

**Cure** / Tür:tip / Type  
Cureyê vê nivîsê îtalîk e.

**Cure::Cor** / Cins:tür / Kind  
Heyber, zarav, pişe, kom yan jî hwd. a li gora taybetmendiyên çêbûye. Ji ber taybetmendiyên xwe ji hev vediqetin.

**Curehiya biyolojîkî::Curehiya jîndehî::Corewcorî zîndeyî::Cûrbicûriya zîndewarî** / Biyolojik çeşitlilik / Biodiversity  
Curbecureya formên zindiyên ên li cîhanê. Li yek cihek diyar an jî di hemû xwezayê de curbecuriya rakandî ya jîndaran, cureyên pergala xwezayî an taksonomiya wan.

**Cureyê nivîsê::Font** / Font:yazı çeşidi / Font  
Cureyê nivîsê.

# Ç

**Çadirgeh** / Kamp / Camp

*Çihê ku çadir lê têne danîn.*

**Çakkirin** / Tamirat / Repairs

*Rastkirin û duristkirina amûr an jî makîneyeke xerabûyî.*

**Çakûç** / Çekic / Hammer

*Serê wî ji hesin û destiyê wî darîn e. Teşe û giraniya wî li gora karê ku ew ê pê bê kirin diguhere. Ji bo şikandin, pelixandin û çêkirina amûrên hesinî tê bikaranîn.*

**Çal::Kort** / Çukur / Hole:Pit

*Çiyê ku li ser ruyê erdê li gor derdora xwe kûr e.*

**Çala reş** / Kara delik / Black hole

*Heybereke ku hêza kêşana wê gelek mezin e, ku ji hemû made û heta tîrêjên ronahiyê nikarin jê dûr bikevin.*

**Çalak** / Aktif / Active

*Ev mirov pir çalak e.*

**Çandin** / Ekim:ekme / Planting

*Karên belavkirina bizir (tov) li ser axê.*

**Çandin** / Ekim:ekmek / Sowing

*Ajotina rehekan.*

**Çandîna yekser** / Dûze ekim / Flat planting

*Yekser lîser erdzemînêde çandîna rehekan an tovan.*

**Çandîniya textayî** / Dûze ekim / Flat planting

*Çandîniya ku bi rêzî (xet) tê kirin.*

**Çandinkar::Çandinvan** / Tarîmcî::Ziraatçî / Agricultu-

rist

*Cotyar. Kesê ku li ser çandîniyê perwerde dftiye. Kesê ku karê çandîniyê dike.*

**Çap** / Baskî::yazdırmak / Print

*Bi alfakariya kompîturê, ji çaperê derxistina nivîs an jî wêneyan.*

**Çaper** / Yazıcı / Printer

*Amûra bi kompîturê ve girêdayî ye û ji bo derxistina nivîs an jî wêneyan li ser kaxiz tê bikaranîn. Du kablo dikevin vê amûrê, yek ji bo enerjîyê (elektrîk), ya din jî ji bo agahiyê (data) ye.*

**Çapkirin** / Yazdır / Print

*Fermana ji bo ku belge di çaperê de li ser kaxez derxîne.*

**Çaqar** / Fener / Lamp:Lantern

*Fenera ku li peravê deryayê tê pêxistin.*

**Çar** / Dört / Four

*Navê hejmarek e. Hejmara piştî pênc. Navê hejmara 4, an jî di jimareya Romayî de IV.*

**Çarçove** / Çerçeve / Frame

*1. Ji bo xemilandin û daleqandina wêne, nivîs, eynik hwd. nexşeya dorê. 2. Di komînkasyonê de şandîna beş an jî parçeyekî daneyê. Ji bo dane bi ewlehî û zêdetir bê şandin weke frame tê pêçan û şandin.*

**Çardeh** / On dört / Fourteen

*Navê hejmarek e. Hejmara piştî sêzdeh. Navê hejmara 14, di jimareya Romayî de XIII.*

**Çargoşe::Lakêşe** / Dörtgen / Quadrangle

*Şêweyên di bîrkariyê de yên çar kenar û çar goşeyên wan hene.*

**Çarrê::Xaçerê** / Dört yol / Crossroad  
*Xaleke rê ku lê çar rê digîjin hev an jî xala ku du rê hev dibirin.*

**Çav** / Göz / Eyes  
*Lebata mirov a ku pê tê dîtin.*

**Çavdêr::Zêrevan** / Denetçi / Controller  
*Kesê karê kontrolê dike*

**Çavdêrî** / Gözlem / Observation  
*Karê nêrînê.*

**Çavdêriya avadanîyê** / İmar denetimi / Audit of zoning  
*Hemû çalekiyên ku li dijî binpêkirina plana îmarê tê kirin.*

**Çavî::Çavik** / Gözenek / Pore  
*Ji bo her qula tiştê qulqulîk.*

**Çavkanî::jêder** / Kaynak / Source  
*Cih an jî heyberên ku jê enerjî (elektrîk, elektro-magnetîk, ronahî, av, hwd.) dertê.*

**Çawanî** / Nitel / Qualitative  
*Rewşa xuya ku nayê hesabandin.*

**Çawanî::Sîma::Sexlet::Senînî** / Nitelik / Feature  
*Taybemendiya ku madeyekê ji yên din vediqetîne.*

**Çawanî::Wesf** / Vasîf:nitelik / Qualification  
*Taybetiya ku tiştan dide nasîn û cudahiya wan nîşan dide.*

**Çeka Kîmyayî** / Kimyasal silah / Chemical weapon  
*Çeka ku li ser mirov, ajal û nebatan bi madeyên jehrdar dibe sedema bûyerên mirinê.*

**Çêkirî::Bidestkirî::Destkird::Çêkirî::Çêbuwar** / Yapay / Artificial  
*Yê/a ku di xwezayê de amade nîn e û ji ber pêdiviyên bi destê mirovan tê çêkirin.*

**Çêlek::Manga** / İnek / Cow  
*Ajaleke kedî ye, ji goşt, şîr û çermê (eyar) wê sûd tê girtin.*

**Çêlik::Têjik** / Yavru / Nestling  
*Têjikên çûkan.*

**Çelîtandin** / Sıyrmak / Skim  
*Lêkeftina bi awayeki lezdarî.*

**Çelqandar** / Çalkalayıcı / Agitator  
*Amûra ku ji bo tevdanê tê bikaranîn.*

**Çeltûka riz** / Pirinç çeltiği / Oryza saliva l.  
*Birinca kû kajênwî nehatiye nekandin.*

**Çem** / Çay / Rill  
*Ava herikbar. Rûbarê biçûk.*

**Çember::Bazine** / Çember / Circle  
*Di rûxar de şêweya ku bi koma xalên li dora xaleke sekan bi awayekî gilover û heman dûrahî ne çêdibe. Şêweyek geometrîk.*

**Çembera çaryek::Çaryek bazine** / Çeyrek çember / Quadrant  
*Beşek ji çar parçeyên yeksan ê bazineyê. Dirêjahiya wê =  $\pi/2$*

**Çembil** / Kulp / Handle  
*Ji bo hilgirtina alavan beşa ku liser alavê tê çikîrin.*

**Çendcareya qada tayan** / Kat alanı kat sayısı / Floor area ratio  
*Li gor eraseyê dê çend tayê wê bê avakirin bi vî awayî tê tespîtkirin.*

**Çendcareya qada zemînê** / Taban alanı katsayısı::taks / Base area ratio  
*Di parsela îmarê de cihê ku binyata xanî (avahî) lê rûdîne.*

**Çeng** / Dirsek / Elbow  
*Parçeyek ji bo girêdana lûleyan e, ku bi vî parçeyî berê lûleyan tê zivirandin.*

**Çeng::Zengil::Zeng** / Çan::Zil / Bell  
*Amûra dengdêr a ji bo hişyariyê. Metaleke qewartî û di navê de hesinekî (zimanok) heye ku dema ev hesin dileqe û li kêleka metal dikeve deng dertê.*

**Çengel::Goçel** / Kanca / Hook  
*Şiva hesinî ya ku serê wî xwar û tûj e, ji bo kişandin an jî hilawistina tiştan bikêr te.*

**Çeprast** / Çapraz / Cross  
*Hevbirîna du xêzên lar (xwar)*

**Çêre** / Otlak / Grassland  
*Cihê ku giya lê hêşîn dibe, pez lê diçêre.*

**Çêrgeh** / Yaylak / Plateau  
*Ji bo keriyên pezi, cihê havin lê tê derbaskirin. Ev cih piranî bilindin, hênikin û çêre lê pire.*

**Çerx** / Çark / Cogwheel

*Ew parçeyê makîneyê ku ji aliyê tewereyekê ve tê zivirandin.*

**Çerxa dirandar::Çerxî dandar::Dirandar::Dirançerx**

/ Dişli / Gear

*Alaveke wek dîsk (gilover) û dora wê niqirokî ye. Çerxa ku diranên wê hene.*

**Çetel** / Çatal / Fork

*Amrazekî serêwî de sê anji çarbi kêrê xwarin xwarinê tê*

**Çewênder::Silq** / Şeker pancarı / Sugar beet

*Fekiyekî ku ji rahên wî yen bi goşt şekerî tê çêkirin.*

**Çewlîk** / Çiftlik / Farm

*Avahiyên ji bo xebatên çandiniyê û xwedîkirina ajalan lê tên kirin.*

**Çewtî** / Hata / Error

*Di kompîterê de lihevqirasebûn û ne lihevhatina kodan.*

**Çewtiya xeterdar** / Kiritik hata / Critical error

*Di kompîterê de lihevqirasebûn û ne lihevhatina kodan a bi awayekî xeterdar.*

**Çik::Stûnî** / Dik / Perpendicular

*Xêz an jî arasteyên ku hev dibirin û di nava wan de 90° heye.*

**Çikane::Stûnî::Tikane::Tikî** / Dikey / Vertical

*Arasteya şaqûlî.*

**Çike::Stûne (-ser)** / Dikme / Perpendicular (to)

*Xêza stûnî ya li gora xêz an jî rûxarekî. Xêza ku rûxarekî bi 90° dibire.*

**Çikilandin** / Dikmek / Prick

*Sekinandina stûnî ya tiştekî di cihekî de. Sekinandina tiştekî yan cîsmekî bi qulkirinê yan jî bi kolanê bi awayekî çik.*

**Çil** / Kirk / Fourty

*Navê hejmarekê ye. Hejmara piştî sî û nehê ye. Navê hejmara 40 e, di jimareya Romayî de XL.*

**Çilmêre::Zirze** / Sürgü / Doorbolt

*Mekanîzmaya ku derî ji aliyê hundir ve digire.*

**Çilmisîn** / Solma / Wanning

*Di warê kîmyayî de pîgmenta ku rengê xwe winda kiriye.*

**Çim::Fîrîz::Çimen** / Çim / Lawn

*Cureyekî giyayê ji famîlyeya genim e, ji bo şînahiya park an jî baxçeyan tê bikaranîn. Giyayekî pirsalî ye.*

**Çimento** / Çimento / Cement

*Ew amraza hîdrolik a hev girtinê ku tevliheviya kevirên kalker û gil, di germahiyê zêde de tên germkirin û hêrandin*

**Çin** / Oya / Lace

*Ne nebate... ji kare çêkirina honandina an jî neqşandina ser cawanre tê gotin.*

**Çinandin::Dirûn::Çinîn** / Biçmek / Reap

*Hilberîniya riwekan.*

**Çip** / Çip:Yonga / Chip

*Hêmaneke elektronîkî ye ku bi madeyê nîvgihîner çêdibe.*

**Çir::Nerm** / Esnek / Flexible/Elastic

*Taybetiya heyberê ya ku bi hêzê şêwe diguherîne û dema hêz radibe vediguhere rewşa xwe ya berê.*

**Çirbûn::Tîrbûn** / Yoğunlaşma / Condensation

*Hilma avê kû tîr dive an jî ava kû hişk dive*

**Çirî** / Özkütle / Mass density

*Mêjera made ya di yekeya qebareyê de. Çiriya avê 1 gr/cm<sup>4</sup>*

**Çirik::Çirane** / Çörten / Gargoyle

*Cihoka ji bo ava barana ku li ser banan kom dibê, ji esasê avahiyên jî dûr direşîne.*

**Çiriya tezûyê::Çiriya herê** / Akım yoğunluğu / Current density

*Rewşa herikîna tezûyê.*

**Çirk** / Saniye / Second

*Yekeya demê ya ku ji 60î yekê xulekê.*

**Çiziran::Avzen** / Sızıntı / Seepage

*Di kanê de zayîna avê. Dema av di kanê de dizê.*

**Çov::Şiv::Rewt::Rod** / Çubuk / Rod

*1. Darê zirav û dirêj. 2. Şêweyê xwedî dirêjahî û ziravî ye.*

**Çûçik** / Cıvıv / Chick

*Çeliyê ajalê pi perr ra tê gotin. Çeliyên ku ji hêk derdikevin ra tê gotin.*

# { D }

**Dabeş::Îfraz** / Ayırma / Subdivision  
*Ji hev veqetandina erd. Parçekirina parsêlan. Par-selek piştî îfrazê dibe ji yekê zêdetir.*

**Daçûn::Hezan** / Göçük / Subsidence  
*Hilweşîna tûnel (serdab), avahî an jî axê ber bi jêr ve.*

**Dadgeh::Edliye** / Adliye sarayı / Courthouse  
*Avahiya ku karên hiqûq û dadmendiyê lê tên meşandin.*

**Dagir** / İşgal / Occupation  
*Vegirtin. Destdanîna ser erdekî ji aliyê ne xwedî ve.*

**Dahatûnasî** / Gelecek bilimi / Futurist  
*Zanista ku derbarê dahatuya civakê de xebat dimêşîne.*

**Dahûrîna komkirinê** / Kümeleme çözümlemesi / Cluster analysis  
*Rêbazeke taybet a çareserkirinê.*

**Dahûrîner** / Çözümleyici / Analyzer  
*Amûra ku sîgnalan kontrol dike û taybetiya sîgnalan nîşandide.*

**Daire::Bazine** / Daire / Disk  
*Rûxara qeteka rûlûlek. Qada nava çemberê.*

**Daireyî::Bazineyî** / Dairesel / Circular  
*Xêza çemberî. Xêza gilover.*

**Daketin::pêşgeh** / Giriş:antre / Entry:access  
*Di avahiyan de hola daketinê.*

**Damara Madenê::Reha madenê::Rega madenê** /

**Damar** / Vein:Lode  
*Xeta ku di bin erdê de gewher tê de kom bûye.*

**Danan::Danîn::Sazkirin** / Tesis etmek:Kurmak / Installation  
*Avakirina pergala (sîstem) an jî amûreke.*

**Danberhev::Berawirdî**/Karşılaştırma/Comparasion  
*Muqayesekirin.*

**Dane** / Veri / Data  
*Agahî û agahiyê di derbarê tiştekî de.*

**Danegeh** / Veri tabanı / Database  
*Hard dîska ku dane tê de têne bi cî kirin. Dane-yên ku ji bo pergalekê û anjî naveroka malperê hatiye afirandin. Di kompîterê de qada ku lê agahî û dane tên bi cî kirin ji bo bikaranînê.*

**Danezan** / İlan / Announcement  
*Agahiyên ku bi niviskî an jî devkî hatine ragihandin.*

**Danhev::Komkirin::Xistineser** / Toplama (işlem olarak toplama) / Addition  
*Yek ji çar kirariyên bingeîn ên matematîkê ye. Kirariya li hev zêdekirina jimarên. Dijbera derkridinê (jêderxistin).*

**Danhevkar::Komker** / Toplayıcı / Adder  
*Yê/a ku dide ser hev. Kirariya ku kom dike. Amûra ku sînyalên cuda digre û dide hev.*

**Danûstendin** / Alım satım / Trade  
*Pêkanîna bazirganiyê (Ticaretê)*

**Dara bêcadê** / Sığla ağacı / Liquidamber  
*Darekî duvê çinarê pê dikeve. Ji govda wî de bal-*

zam derdikeve. *Ev balzam jî, hekîmiya kozmetîk te tê xebitandin. Donê darê di sabunde u pafumande tê xebitandin.*

**Dara gûzê** / Ceviz ağacı / Juglans regina l.  
*Darekî temenê wî pir dirijê. Qurmên vî dare ji ber kû gelek qewîme di necariyêde tê bikar anîn. Alav û gelek amûr berê ji vî darê dihat çêkirin. Disa sirûd ji kankilê vi darê zi tê sitandin.*

**Dara Kizwanê::Dara şengêlê::Dareben::Dara benîştê** / Bittim ağacı / Pistacia eurycarpa yalt  
*Dareke ku orjîna wê ji Kurdistanê ye. Ji fêkiya wê qehwe, sabûn, tizbî tîn çêkirin. Famîlyeyeke darên pelfireh e. Makedara fistiqê ye.*

**Dardaroka elektrîkê** / Elektrik sarkacı / Electric pendulum  
*Kûreyekî ku bi madeyekî ne gihêner daleqandiyê û li gora barê elektrîkê yê dora xwe pêş de an jî paş de diçe.*

**Dardaroka hêsan** /Basit sarkaç /Simple pendulum  
*Benekî hilawistî girêdayî û bi seriyê serbest ve heyberêkî bi giraniya G heye û bi awayekî serbest tevdi gere.*

**Darêj** / Döküm / Casting:Dump  
*Ji bo teşedayîna metalan helandin û rijandina nava kalib.*

**Darika amrazan** / Araç çubuğu / Toolbar  
*Di kompî terê de parçeyek ji bernameyê mîna geroka înternetê an jî autocadê ye ku alîkariya bi-karhêner dike.*

**Darika pêşdeçûnê** /İlerleme çubuğu /Progress bar  
*Di kompî turê de nîşandêra barbûyîna agahiyan e.*

**Darika rewşê** / Durum çubuğu / Statusbar  
*Di kompî terê de li jêra rûpel e û agahî di derbarê rûpel de dide.*

**Darîn::textîn::Depîn** / Ahşap / Wooden  
*Tiştên ku ji daran çêdibin.*

**Daristan** / Orman / Forest  
*Qada daran.*

**Darîştaya kanzaya req::Amêjeya metala req** / Sert metal alaşımı / Hard-metal alloy  
*Amêjeya metal a ku dijwar e. Mînak; Pola, Tûnc*

**Das::Şalok** / Orak / Reaping-hook  
*Amûreke ku ji bo birîna hejik, qirşik, giya û hwd. tê bikaranîn.*

**Dawerivîn** / Süzme / Filtration  
*Ji hev veqetandina madeyên hişk û şilek bi alîkariya heyberêkî ku madeyên şilek tê de derbas dibe.*

**Dawerkêr** / Damıtıcı / Alembic  
*Amana laboratuwar ku madeyên şilek tê de tê dowerandin.*

**Dawîleanîna hevpariyê** / Paydaşlığın giderilmesi / Elimination of fellowship  
*Di mulkiyeta hevparde, qedandina hevpariyê.*

**Dawîn::Paşîn** / Son / Last:End  
*Tiştê ku li herî paş maye, li dawiyê ye.*

**Daxistger** / İndirgen / Reductant  
*Di reaksiyonên kîmyayî de madeyê ku bergira elektrîkî ya metalekî dadixîne.*

**Daxistgerî** / İndirgenme / Reduction  
*Di reaksiyonên kîmyayî de karê daxistina bergira elektrîkê ya metalan.*

**Daxuran** / Erozyon / Erosion  
*Xwe ranegirtina axê li hemberî herikandina av, ba û baranê.*

**Dazelandin::Parzinandin::Dawerivandin::Sefandin** / Süzme / Filter  
*Heke çend tiştên cuda (dibe ku ev tişt madeyên şilek an jî agahiyên cuda bin) di nav hev de bin û mirov bixwaze wan ji hev veqetîne mirov karê "dazelandin"ê dike. Mirov wan tiştan dadizelîne.*

**Dazelîn** / Damıtma / Distillation  
*Ji hev veqetandina madeyên şilek. Mînak:Dîzel, Benzîn û rûn ji petrola xav têne veqetandin.*

**Def::Dahol** / Davul / Drum  
*Def amûreke muzîkê ye. Def ji text û eyarê (çerm) ajalan çêdibe. Textikê tenik tê tewandin û dikeve şeweyê rûloyekê piştê jî aliyekî rûloyê (sîlîndîr) bi eyar tê gir tin. Dema tiştêk li eyar dikeve deng jê dertê.*

**Deh** / On / Ten  
*Navê hejmarekê ye. Ji jimara 9ê girtir, ji jimara 11ê jî biçûktir e. Bi awayê 10 tê nivîsîn. Di jimareya Romayî de X.*

**Deh hezar** / On bin / Ten thousand  
*Navê hejmarekê ye. Bi awayê 10000 tê nivîsîn.*

**Dehkenar::Dehgoşe** / Ongen / Decagon  
*Şeweya ku deh la (kêlek) û deh goşeyên wê*



*hene, dirêjahiya hemû layên wê yeksanin û goşeyên ji navda yên wê jî 144 pile (degree) ne.*

**Dehlîz::navrê** / Çevredaliz:dehliz / Ambulatory  
*Derbastgehên teng û sergirtî yên di nav avahiyên dîrokî de.*

**Dehşik::Cehş** / Sipa / Colt  
*Têjikên keran.*

**Dekagram** / Dekagram / Decagram  
*Yekeya giraniyê ya ku 10 car li gramê ye.*

**Dekalître** / Dekalitre / Decaliter  
*Yekeya qebareyê ya ku 10 car li lître yê ye.*

**Dekametre** / Dekametre / Decameter  
*Yekeya dirêjahiyê ya ku 10 car li metreyê ye.*

**Dekar** / Dekar / Decare  
*Deh caran Ar (100 m kare) 'ê ye û 1000 metre kare. Ar jî wekhevê 100 metre kare ye.*

**Dêlegur** / Dişikurt / Female wolf  
*Gura mê.*

**Dêlî::Mêw** / Asma (üzüm bağı) / Vine (vineyard)  
*Dara tîrî.*

**Dêlik** / Kancık:Köpeğin dişisi / Female dog  
*Kûçika mê.*

**Dêlîn** / Kamaşma / Glare  
*Bi bandora şewqa zêde nedîtina çavan.*

**Defînbar::Derbasbar** / Geçirgen / Permeable  
*Rûyê ku madeyê şilek û gaz dibihurîne.*

**Dema betal** / Boş zaman / Idle time  
*Di kompîterê de dema ku bername naxebite.*

**Dema gerê** / Devir sûresi / Cycle time  
*Di sînyalekî de dema ku yek dewr digire. Dema 1 frekasê.  $T=1/f$*

**Dema gihîştinê** / Varîş sûresi / Arrival time  
*Di çûyîna ji cihek heta cihek din de dema ku derbas dibe.*

**Dema ragihîştinê** / Erişim sûresi / Access time  
*Di kompîterê de dema ku ji bo yek yekê dane were xwendin.*

**Deman::Kirê** / Kiralamak / Rent  
*Tiştê ku ji aliyê xwediyê wî ve ji bo demekê û bi buhayekî tê dayîn.*

*Ji temamê tiştên di bin hev de hatine nivîsandin re tê gotin, lîste. "Karsaz jî ji bo karê me yê îro lîsteyekê dîrêj da me."*

**Lîstîk** / Oyun / Game  
*Tevgerên li gora hin rêbazan tên kirin û encamek jê tê girtin.*

**Lîtav::Hezek::Cimcime::Zongav** /Bataklık /Swamp  
*Li ser zemîneke kort û avtênebihûrî de berhev-bûna herî û ava baranê yan jî ava avzêmekê.*

**Lîtosfer** / Litosfer / Lithosphere  
*Avaniyê li dinyayê ye, di tebeqeyên bejahiyê de ya herî li derve ye. Stûrbûna wê nêzî 33 km'yan e. Ji vê avaniyê re Gogîerd jî tê gotin*

**Lîtyûm** / Lityum / Lithium  
*Elementeke kîmyayî ye. Numreya wê ya atomê 3 ye û bi kurteya "li" tê nîşandan.*

**Liv::Cûle** / Devim / Motion  
*Tevger.*

**Livandin::Libitandin** / Hareket ettirmek / Move  
*Bi rêya tehdan û leqandinê hereketkirina tiştekî.*

**Livîna erdhejê** / Deprem hareketi / Earthquake motion  
*Drûvê liv û tevgera a kû di encama erdhejê de pêk tê*

**Lûwan::Eywan** / Salon / Sallon  
*Menzela mezin, eywan.*

**Lûwan::Galerî** / Galeri / Gallery  
*Beşa avahiyar a ku ji avahiyar ber bi derva derdikeve û herî kêm aliyek wî vekiriyê.*

**Lixwegirtin** / Taahhüt / Commitment  
*Girtina ser xwe ya berpîrsiyariya karekî.*

**Lodkirin** / Yığmak / Accumulate  
*Berhevkirina bi awayê çêkirina girekî.*

**Logarîtm** / Logaritma / Logarithm  
*Kirariyê matematîkê. Bi kurtkirî "log" tê nivîsîn. Mînak,  $\log_2 8 = 3$  e.*

**Lojîstîk** / Lojistik / Logistics  
*Zanistê ji bo çalakîyên bidestxstina suxre û mal; plangerî, birêxistinî û rêvebertî ye.*

**Lokawt** / Lokavt / Lockout  
*Taktîka karsaz a ku karkeran bi hev re ji kar derdixe.*

**Luks** / Lüks (ışık şiddeti birimi) / Lux  
*Yekeya pîvana ronahiyê.*

**Lûle::Borî** / Boru / Pipe  
*Ji bo ku madeya şilek, gaz û madeyên mîna vana ji cihekî ber bi cihekî din ve werin veguhastin tê bikaranîn. Av an jî ba ji seriyekî dîkevê û ji seriyê din derdikeve. Dişibe sîlîndîrekê (rûlûlek) nava wî vala.*

**Lûleya pestan-berz::Lûleya pestan-bilind** / Yüksek basıncı borusu / High-pressure pipe  
*Lûleya ku di bin bandora pestoya zêde de dixebite.*

**Lûlik::Buret** / Büret / Burette  
*Di laboratûarê de ji bona tîtrasyonê tê bikaranîn. Qebareya şilaviyê dipîve. Aliyekî wê girtî, aliyên dinê vekirî ye.*

**Lûlpêç** / Helezon: Spiral / Spiral  
*Şeweyê xêza li dora lûleyekê lefandî. Şeweyekî sîmetrîk e.*

**Lûtesyûm** / Lütesyum / Lutecium  
*Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 71 e û bi kurteya "lu" tê nasîn.*

# } M }

**Macûn::Mom** / Macun / Casking compound  
*Madeyê ku bûye wek hevîr. Ji bo girtina derz û girtina navbera tiştan (wekî cam) tê bikaranîn.*

**Macûnkirin::Momkerdey** / Macunlama / Casking  
*Karê kirina macûnê.*

**Madeya Kîmyayî::Daringa Kîmyayî** / Kîmyasal madde / Chemical substance  
*Hemû maddeyên ku li zanîna kîmyayî tên bikaranîn.*

**Madeya Raguhêzbar** / Îletken madde / Conducting material  
*Cureya madeyê ku tê de elektrîk derbas dibe.  
 Elektronê dawî ya atoma van madeyan bi hêsanî jê diqete.*

**Madeya xav (xam) ::Daringa Xav** / Ham madde / Raw material  
*Madeyên ku di çêkirina heyberekê de tên bikaranîn lê hê neketiye rewşa xwe ya dawî. Mînak: Petrola xav (xam), Zêrê tevî nava axê.*

**Madeyê tiwawe** / Çözûnen madde / Solute  
*Di gîraweyan de madeyên ku di nava şilekê de hûr dibin û bi parçeyên ku bi çav nayên dîtin belav dibin. Mînak: Şekirê nava avê.*

**Madeyê tiwêner** / Çözücü madde / Solvent  
*Di gîraweyan de madeya ku di nava xwe de madeyên din hûr dike û bi parçeyên ku bi çav nayên dîtin belav dike. Mînak: Di şerbetê de av madeya tiwêner e.*

**Mafê derbasbûnê** / Geçit hakkı / Right of passage  
*Mafê derbasbûnê di ser parsêleke de û bi vî awayî gihîştina parsêleke din ya bê rê.*

**Mafê gelemperî** / Kamu hakkı / Civil right  
*Mafên zagonî yê hemwelatîyan.*

**Mafê îrtifaqê** / İrtifak hakkı / Easement  
*Di bilindahî û kûrahiyê de sînokirina mafê xwedîtiyê ya sînokirî.*

**Mafê sererê** / Üst hakkı / Right of construction  
*Tenê mafê sûdgirtin an jî bikaranîna li ser rûyê erdê. Mînak: Li ser parselê tenê çêkirina xanî an jî çandin.*

**Mafê sûdegirtinê** / Yararlanma hakkı / Right to benefit from  
*Mafê bikaranîna xanîberan.*

**Mafê xwedîtiyê** / Mülkiyet hakkı / Property right  
*Li gorî rêzikên hiqûqî mafê kesan yê li ser bikaranîna jê sûdwegirtin û sexbêrî kirina malên guhêzbar û neguhêzbar e.*

**Magnezyûm** / Magnezyum / Magnesium  
*Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 12 e û bi kurteya "mg" tê nasîn.*

**Make** / Anaç / Stock  
*Darên ku fekiyan didin.*

**Makro** / Makro / Macro  
*Dijberî mîkro, fireh, mezin. "Ew proje di planên makro de cih digire."*

**Mal::Serrûpel** / Anasayfa / Home  
*Di kompîturê de destpêk, rûpela destpêkê. Rûpela herî pêş a yekem ku agahiyan der heqê naverokê de dide, di dosyayekê yan jî rûpelên ku di Internetê de ji bo mijarekê hatine ava kirin.*

**Male** / Mala / Trowel

*Alava ku mirov pê xerca dîwar û ciyên din rast dike.*

**Malê gelemperî ya hevpar** / Kamu ortak mali / Common property of the public  
*Mulkiyeta ku ne ya tukesî, malê ûmûmî, yê gelemperî, para herkesî tê de. Mînak: Riyên bajêr, park...*

**Malika dehan::Xaneyaya dehan** / Onlar hanesi / Decimal place  
*Di matematîkê de hejmarê ji rastê ve di rêza du-duyan de. Nirxê vê hejmarê, hejmar çî be ew qas car li deh e.*

**Malîkxane::wargeh::xanûman::Qesr::Košk** / Malikane / Manor house  
*Xaniyên şanedar ên ku li ser warek mezin hatine avakirin.*

**Malper** / İnternet sitesi / Web page  
*Di İnternetê de li ser hinek mijaran ên ku ji aliyê kes an jî sazîyan ve rûpelên ji bo agahî yan jî otomasyonê hatine çêkirin. "Navnîşana malpera ku endezyarên kurd ji bo xebatên li ser zimanê kurdî çêkirine "www.endezyar.org" e."*

**Malpera nûçeyan** / Haber sistesi / News site  
*Di İnternetê de rûpelên ji bo agahiyên bûyeran an jî ji mijarên rojane hatine avakirin.*

**Mandali::Lalengî** / Mandalina / Mandarin  
*Fêkiyeke ji malbata narincîyan e.*

**Manend** / Emsal / Comparables  
*Rêjeya qada maksîmûm a çêkirina li ser parsel (lat) ekê û mafê avahiyê.*

**Mangan::Manganez** / Mangan::Manganez / Manganese  
*Elementeke kîmyayî ye. Numreya atomê 25 e û bi kurteya "mn" tê nasîn.*

**Mango** / Hint kirazi / Mangifera domestica  
*Ji familyeya simaqê fêkiyeke tropîk.*

**Mar** / Yılan / Snake  
*Ajaleke kişok, xwe bi erdê ve kaş dike.*

**Mase::mêze** / Masa / Table  
*Mobilyayên ku ji tableyê li ser çend piyan an ji li ser destekê dîsekine.*

**Mastar** / Mastar / Float  
*Alava ku ji bo sererastkirina sewax û şebê tê bikaranîn.*

**Masule::Gergere** / Makara / Pulley  
*Amûra ku bi alîkariya werîs ji bo hilkişandina barekî tê bikaranîn, wek lûleyek gilover e û li dora*

*xwe dizivire.*

**Maşîk** / Maşa / Tong  
*Amûreke lajwerdî ya bi du milan e. Ji bo girtina tiştên wek agir an jî pereng û ji bo lihevixistina peyngan tê bikar anîn.*

**Mat (rengê sar)** / Mat / Opaque  
*Rengê ku nabirîqe.*

**Mausped** / Mousepad / Mousepad  
*Rûbarê ku ji bo mişk (mouse) ê komputerê li ser xweştir bixebite tê bikaranîn.*

**Mazot** / Mazot / Diesel  
*Cureyekî sotemeniyê ye û bi piranî di erebeyan de bi kêr tê. Bi dawerivandina petrola xam bi dest dikeve.*

**Megawat** / Megavat / Megawatt  
*Watt yekîneya hêzê ya yekteşe ya navneteweyî ye. Megawatt ji wattê milyon qatî zêde ye.*

**Mehandin::Daxuran** / Aşındırmak / Erode  
*Ziravkirina bi bihevûnê (lêketinê). Mirov dikare rûberê bi madeyeke ji wî rûberî hişkîtir bimehîne. "Serê wê kêrikê mehandî ye."*

**Mehîn::Mehan** / Aşınma::Yıpranma / Wear  
*Kevnûn an jî peritîna bi demê re.*

**Mêjandin** / Emzirmek / Impregnate (to)  
*Têrkirin, tehmandin (deqandin), kirina mijandinê.*

**Mekanîzma** / Mekanizma / Mechanism  
*Ji bo bidestxistina encameke diyarkirî; pevrûnîştina parçe an jî lebatên verastkirina tevlihev. Pergal, sazgerîna. (mekanîzma)*

**Melbend** / Nahiye / Region  
*Beşên navçeyan ên ku bi gerînendek tên birêvebirin.*

**Melêv** / Yaba / Hayfork  
*Amûrek e li benderê tê xebitandin.*

**Melêva hesinî** / Demir yaba / Iron forks  
*Amûrek e li benderê tê xebitandin.*

**Mêfî::Meyildar::Lagîr** / Eğlimliçyanlı / Biased  
*Xêz an jî rûxarên ku di nava wan û erdê de goşe hene.*

**Meme** / Meme / Nozzle  
*Di motorê de ji bo benzîn an jî dîzel pêkeve tê bikaranîn. Dîzelê dipijiqîne nava pîston.*

**Menu** / Menü / Menu  
*Lîsteya ferman an jî vebijêrkan.*

**Mer** / Bel: kazi kûreği / Digging shovel  
*Bêra kolanê*

**Mêrg** / Çayırık / Meadow  
*Parzemî nê n ku bo çêrandina ajalan tên bikaranîn.*

**Mêrg** / Mera / Grassland  
*Parzemî nê n ku bo çêrandina ajalan tên bikaranîn.*

**Mertal** / Kalkan / Shield  
*Amûra ji bo parastinê tê bikaranîn.*

**Mertala daçûnê::Mertala hezanê** / Göçük kalkanı / Gob shield  
*Mertala ku ji bo zexîmkirina hezê ye.*

**Mesafe::Mawe** / Mesafe / Distance  
*Dirêjahiya navbera du xalan.*

**Mestekî kirin** / Reçinelemek / Resining  
*Bi maddeya mestekî reşkirina cihêkê.*

**Mestekî::Benîştê darê** / Reçine / Resin  
*Madeyekî silek û debûş ku ji darê dirêje û piştê derket derve hişk dibe. Rengê wê zelal e.*

**Mêşa spî** / Beyaz sinek / Whitefly  
*Ajaleke ji koma kêzikan.*

**Mêşin::Mih** / Koyun / Sheep  
*Ajaleke kedîkirî.*

**Mêşlok::Kêz::Kêzik** / Böcek / Insect: Bug  
*Ajalên heşerat.*

**Mêşloknasî** / Böcek bilimi / Insect science: Entomology  
*Zanista ku mêşan dide nasandin.*

**Meşlûr::Benî** / Sucuk:badem ve ceviz içi ile yapılan tatlı sucuk / Fermented sausage  
*Xwarineke ku ji cureyekî berhemên şîreya tîrî tê çêkirin. Kakilê behîv an jî gûzê bi ta (benik) ve dikin û di pilora şîreya tîrî de dikin.*

**Mêşvanî::Mêşkarî** / Anıcılık / Apiculture: Beekeeping  
*Xwedîkirina mêşên hingiv.*

**Metala resen** / Soy metal / Noble metal  
*Metalên ku xwe ji ber reydaçûna hewayê xerab (rutubet) û astbilindbûnê diparêze.*

**Metalên Alkalî yên Axê** / Toprak alkali metaller / Alkaline earth metals  
*Komek rastkêşa periyodik e. Ji serî ve koma duymîn e.*

**Metalûrjî** / Metalûrji / Metallurgical  
*Beşa zanîsta dest xistina metala ye. An jî Zanînê avakirin û sefandina gewherên xam.*

**Meteor::Kevirê asîmanî** / Meteor taşı / Meteor  
*Navê madeyên ku ji fezayê dikevin rûyê cîhanê.*

**Metre** / Metre / Meter  
*Nîşana wê m e. Metre yekeya SI (Système international d'unités) bo dirêjahiyê ye. Yek metre hatiye pênasîn wek dirêjahiya ko ronahî di dema 1/299 792 458 çirkeyê de dibire.*

**Mevzûata îstîmqaqê** / Kamulaştırma mevzuatı / Legislation concerning nationalization  
*Zagon û rêzîknameya ku li ser îstîmqaqê hatiye nivîsandin û sazkin.*

**Mêw** / Asma / Vine  
*Dara tîrî.*

**Mewij** / Kuru üzüm / Raisins  
*Tiriyê hişkkirî.*

**Meyan::meyl::xwarî** / Meyil / Predisposition  
*Xwarî, Xûzî*

**Meyldar** / Eğimli / Inclined  
*Ciyên kaş, berjar an jî berjêr.*

**Mezel::Ode:jûr** / Oda / Room:Chamber:Apartment  
*Beşên avahiyên ku mirov lê dijî, radizê, dixebite.*

**Mêzîn** / Terazi / Scales  
*Amûra ku baristeya made dipîve.*

**Mezin::Gewre** / Büyük / Big  
*Di pîvanê de ya zêde. Bi çawanî, nîrx an jî bi dîmena xwe zêdetir.*

**Mêzîna avê** / Su terazisi / Water gauge  
*Amûra ku berwariya (asoyî) rûxarekî an jî xêzeka rast kifş dike. Lûleyek cam ku di navê de av û pelqên hewayê hene li ser depê (texteyê) ve zeliqan-diye çê dibe. Wexta ku rûxar rast be pelqên hewayê di nîvî de disekin.*

**Mezinbûn** / Büyüme / Grow (to)  
*Firehiya, çawanîya ji berê zêdetir. Zêdebûna emr, pîr/kal bûn.*

**Mezûre::Lûleya pilekirî** / Mezûr / Graduated cylinder  
*Amana azmûnê a kîmyayî.*

**Mifte::Kilît** / Anahtar / Key  
*Amûra ku ji bo vekirin û girtina deriyên tê bikaranîn.*

**Mihîn** / Dişi at / Female horse  
*Hespa mê.*

**Mij** / Sis / Fog  
*Li ruyê erdê cureyekê ewr.*

**Mijar::Babet** / Konu / Subject

*Di nivîs, axaftin an jî di weşanê de fikra bingehîn. Bûyer, pirsgirêk an jî rewş. Tiştê li ser tê axaftin, xebat tê kirin.*

**Mijek::Mijer** / Soğurucu / Absorber

*Li hemûyê maşinan ku bi elektrîk an agir dixebitin, ji bo motorê wan zirar nebinin teve çek û çolên sarkirok tê sazandin. Hemuyê çek û çolên ku bi wi awayê dixebitin ji wan ra sarkirok tên gotîn.*

**Mijîn::Mêtin** / Emmek / Suck

*1. Kişandina madeyên şilek an jî gazê. 2. Bi alîkariya ziman, lêv û gewriyê kişandina heyberekî.*

**Mikap** / Mikap:metreküp / Cubic meter

*Kûpê ku her keviyê wî metreyek e, qewariya (hecim) wî dike mîkapek. "Pênc mikap qûm."*

**Mikrofon** / Mikrofon / Microphone

*Amûra ku bi bandora herikîna elektrîkê, deng digihîjne denggirê.*

**Mikron** / Mikron / Micron

*Ji milyonê yeka metreyê. Ji hezaran yeka mîlîmetreyê. Pîvaneke dirêjîya mîkroskopîk e.*

**Mikroprosesor::YÇN (Yekeya Çareserkirina Navendî)** / Mikroişlemci / Cpu:Central processing unit

*Di kompîturê de parçeyê herî girîng. Mêjiyê kompîturê.*

**Mikroskopa ronakî** / Işık mikroskobu / Light microscope

*Amûra bi alîkariya çirûskên ronahiyê tiştên biçûk mezin dike.*

**Milê mêzîne** / Terazî kolu / Beam

*Aliyek (mîlek) ji amûra giranîpîvê.*

**Milîfître** / Millilitre / Milliliter

*Yekeya pîvanê ya qebareyê ye. Ji hezar yek a lîtrayê ye. (1/1000 L)*

**Milîmetre** / Milimetre / Millimeter

*Yekeya pîvanê ya dirêjahiyê ye. Ji hezar yek a metreyê ye. (1/1000 m)*

**Milyar** / Milyar / Billion

*Hejmarake ku ji hezar car milyonî pêk tê. Navê hejmarê 1.000.000.000 e.*

**Milyar elektron volt (yekeya enerjîyê)** / Milyar elektron volt (enerjî birim) / Bev (billion electron volt)

*Yekeya enerjîyê. Milyar carê di bin barê potansiyela voltekê de hilgirtina enerjîya elektronekî. 1 mev=1,602.10<sup>-10</sup> j.*

**Milyem** / Milyem / Artillery mil

*Cûreyeka yekeya goşeyê (hoke) ye. Pîranî di leşkeriyê de tê bikaranîn. 360 pile 6400 milyem e.*

**Milyon** / Milyon / Millions

*Navê hejmarekê. Hejmarê 1.000.000. Hezar car hezar.*

**Minandin::Sîmûlasyon** / Simüle etmek / Simulate

*Ew bernamêyên ku ji bo çêkirin an jî ceribandina amûr, pêşnûma û makîneyan bi taybetî jî bi alîkariya kompîturê tên çêkirin da ku amûr, pêşnûma yan jî makîne were fêmkirin. "Bûmelerza (erdhêj) çêkirî, bernamêya ji bo hînbûyîna bikaranîna makîneyekê"*

**Minare** / Minare / Minaret

*Barûyên zirav û dirêj ên ku li camiyan ji bo li serê bang tê dayîn.*

**Mintiqaya sanayî ya organîze** / Organize sanayi bölgesi / Organized industrial zone

*Herêma ku ji bo pîşesaziyê (sanayî) hatiye veqetandin.*

**Mintiqaya serbest** / Serbest bölge / Free zone

*Herêma ku ji bo bazirganî û hilberîne ye lê ji zagonên derbasdar ên bazirganî, îktîsadî û dadmendî muaf e.*

**Miqnetîsa karebayî** / Elektro magnet / Electro magnet

*Amûra ku bi lefandina kabloyê li dora madeyê gi-hêner çêdibe û dema kareba di vê kabloyê de derbas dibe miqnetîseke çêkirî çêdibe.*

**Mirat** / Miras (tereki) / Inheritance (estate)

*Mal û mülkê ku ji aliyê nasekî mirî ve ji yekê re mabe.*

**Mîrathîştî** / Muris / Legator

*Yê mirî û li pey xwe mîrat hiştî. Kesê mîrat jê mayî.*

**Mîratname** / Veraset belgesi / Certificate of inheritance

*Belgeya ku mafê miratê nîşandide.*

**Mîrîşk::Tûtîk** / Tavuk / Chicken

*Ajaleke kedî ye, di xoxê de mezin dibe. Ji hêk û goştê wê sûd tê wergirtin.*

**Mîrkut** / Tokmak / Mallet

*Wek çakûçekî mezin ê ji dar çêdibe. Darê savarê. Darê ku conî dikute.*

**Mîsas** / Övendir: Sapı uzun bir çeşit spatula / A kind of a long-handled spatula

*Darek ku cotyar bikar tîne, serê wî wek rihoxk û*



*destiyê wî jî darîn e. Ji bo ku heriya gîsin were paqijkirin tê bikaranîn.*

**Misîn** / İbrik / Pitcher

*Amûreke ku ji bo avê tê bikaranîn. Ji bo çûn û hatina destavê bi kêr tê.*

**Mişk** / Fare / Mouse

*Amûreke ji kompîturê ye. Amûra elektrîkî a ku li ser rûberê rast bi alîkariya zivirandina goşeke qeydker diivîne (dilibitîne). Bi mişk mirov dikare di dosyayên kompîturê de nivîs, şêwe, wêne hwd. hilbijêre.*

**Mitbex::Aşxane::Lênangeh** / Mutfak / Kitchen

*Di avahiyên de ciyê ku lê xwarin tê amadekirin, pehtin.*

**Mîxê rêhesin::Bizmarê rêhesin** / Ray çivisi / Rail spike

*Hêşine kurt e, di rêkên tren, tramway hwd. de riyê zexm digire û li gorî cureya xwe tê çêkirin.*

**Mizgeft** / Cami / Mosque

*Avahiya ku misilman tê de îbadetê dikin. Misilman jê re dibêjin mala Xwedê.*

**Mol** / Mol / Mole

*Madeya bi qasî hejmarê avagadro (6, 0221415·10<sup>23</sup>) atom an jî molekul bigire.*

**Molarîte** / Molarite / Molarity

*Rêjeya an jî çend molê madeyê tiwawe ku di lîtreyek madeyê tiwêner de ye.*

**Molekul::Gerd** / Molekül / Molecule

*Madeya ku ji atomekê zêdetir atoman (gerdîle) pêk tê û taybetmendiyên elementan nîşan dide.*

**Momenta Dîpolê** / Dipol momenti / Dipole moment  
*Momenta du alî.*

**Momentûm** / Momentum / Momentum

*Lêkdan (Carîn) a barîste û leza madeyek. Pîvanek vektorel e. Xwedî araste ye.*

**Momentûma Goşeyî** / Aşsal momentum / Angular momentum

*Zivirîna momentûma xêzikî ya madeyekî li gor xalekî.*

**Monomer** / Monomer / Monomer

*Molekûlek biçûk e, ji bo girêdana kîmyayî ya monomeran e, pê polîmer çê dibin.*

**Mor** / Mühür / Seal

*Bi taybetî di nivîsên fermî de nîşaneka taybet a erêkirinê ye.*

**Morg** / Morg / Morgue

*Li nexweşxaneyan an jî li goristanan ciyên sar ên ji bo mirî lê ji bo demekê tên veşartin.*

**Motel** / Motel / Road house:Motel

*Otêlên biçûk ku li ser rêyan tên avakirin, ji bo ku mirov lê demekê bimîne û pêdiviyên xwe pêk bîne.*

**Motor** / Motor / Motor

*Mekanîzmaya ku her cureyên enerjîyê vediguherîne enerjîya mekanîk.*

**Movik::Cumge** / Mafsal:Boğum / Joint

*Parçeyekî ku du beşan bi hev ve girêdide lê tevahiya tevgera wan asteng nake. Girêdaneke bi tevger.*

**Mozik** / Dana / Calf

*Golikên ku dev ji şîrvexwarinê berdane.*

**Mûc::Qelem** / Keski / Chisel

*Ji bo rihostina dar, kevir, metal û hwd. amûreke hesinî ku seriyekî wê tîj û seriyê din jî ko ye, da ku bi çakûç were kutan.*

Mûçing / Cimbiz / Tweezers

1. Amûreke ku dişibe maşîkê ye, ji bo girtin û kişandina heyberên zirav û biçûk tê bikaranîn. 2. Amûra ku mû pê tên kişandin.

**Mugnekar** / Endüktör / Inductor

*Alavê elektrîkî ku bi tîla li dora hev pêçayî çêdibe û dema di tîlê de tezû dibore flakseke magnetîsî derdixe holê.*

**Mulk** / Mülk / Property

*Alav, erd, zêvî û hwd. ku ne aîdê saziyekî (weqf û dewlet) ne, aîdê mirovekî ne.*

**Mulkê dewrî** / Devre mülk / Time sharing

*Mafê xwedîtiya tenê ji bo demekê. Mînak: Mafê bikaranîna xaniyekê di salê de tenê ji bo mehekê an jî 15 rojan.*

**Mulkiyeta beşê::Xwedîtiya beşê** / Kat mülkiyeti / Condominium

*Xwedîtiya li ser parselê hevpar, lê di xaniyên li ser parselê de ji bo her xaniyekê xweser e.*

**Mûm** / Mum (îşk yoğunluğu birimi) / Candle

*Yekeya çîriya ronahiyê*

**Muz** / Muz / Musa

*Fêkiyeke tropîk.*

**Muze::Kevnargeh** / Müze / Museum

*Ciyê ku lê pêşandana berhemên zanistî û dîrokî tê kirin.*

# { N }

**Nane** / Nane / Mentha  
*Giyayekî aromatîk.*

**Nanê çûçê::Nançivîk** / Kuş ekmeği / Polygdnum cognatum  
*Giyayekî mergê ye û li qeraxa çem şîn tê.*

**Naneya nepak::Pûjana nepak** / Adi nane / Mentha savla l.  
*Ji pelên vê giyayê baharat çedibe. Li cihên avî hêşîn dibe.*

**Naskirî** / Taninmiş / Well-known  
*Kesîê/a ku bi hinek taybetiyên xwe navdar be.*

**Nasname** / Kimlik / Identity  
*Wesîqeya ku kesekî dide nasîn.*

**Nav::Hundir** / İç / Inside  
*Dijberê derve ye, ciyê ku dora wî girtî ye.*

**Navbir** / Bölme duvar / Dividing wall  
*Dîwarê ku beşekê jî hev diqetîne.*

**Navder** / Antre / Entree  
*Di ketina hundir de beşa pêşîn.*

**Navê bikarhêner** / Kullanıcı adı / Username  
*Kesên ku makîne, kompîtur û bernameyên kompîturê hwd. bi kar tîne.*

**Navenda Elektrîkê::santral** / Elektrik santrali::şalt sahası / Power plants::Switchyard  
*Fabrîqeya ku di xwezayê de enerjîya cuda vedi-guherîne enerjîya elektrîkê. "Santrala elektrîkê, santrala nukleerê."*

**Navenda turîzmê** / Turizm merkezi / Tourism center

*Di bajar an jî herêmekê de cihê ku bi taybetiyên xwe yên dîrokî, xwezayî û hwd. tê nasîn.*

**Navendî::Santral** / Özensel::merkezi / Central  
*Ê di navendê de. Ê ku navendê çêdikin. "Santrala telefonê."*

**Navendkirin** / Merkezlendirme / Centering  
*Navendkirina alava pîvanê ya li ser xala pîvanê. Xeta şakûlî (stûnî) pêwîst e hem li navenda alava pîvanê hem jî li navenda di xala pîvanê de derbas bibe.*

**Naverok** / İçerik / Content  
*Bi kurtasî mijarên ku di navê de.*

**Navhoke::Navgoşe::Zerehoke::Goşeya ji navda** / İç açı / Internal angle:Interior angle  
*Di pirgoşeyek de goşeyên hundir ên di navbera her du kêlekên bi hev ve.*

**Navnîşan** / Adres / Address  
*Di daneyeke înfomatîk de di nav bîra (hiş) kakil de cî yan jî rêya gihîştina daneyê.*

**Naylon** / Naylon / Nylon  
*Madeya zexm û qayîşokî.*

**Navzan::Nezanraw::Nenasbar** / Bilinmeyen / Unknown  
*Di hev kêşeyên matematîkê de hejmarê ku nirxa û çendaniya wê ne diyar e.*

**Nediyar** / Belirsiz / Undetermined  
*Ne eşkerebûna nîrx û çendaniyê.*

**Nediyarî** / Belirsizlik:Kesinsizlik / Uncertainty  
*Rewşa nediyarbûnê.*

**Nefel** / Yonca / Lucerin alfaalfa  
*Giyayek e, ji famîlyeya baqlan e.*

**Nefela pê ya balindeyî** / Gazal boynuzu: lüfer otu / Lotus hakkariensis  
*Nefeleke ku kulîlkên wê zer in.*

**Nefta xam** / Ham petrol / Crude oil  
*Nefta ji hevneqetandî. Li ser xebat nehatiye kirin. Nefta ji bin erdê çawa derketibe bi wî awayî.*

**Negatîf** / Negatif / Negative  
*Hejmara ku ji sifirê biçûktir e. Kêmek (-) Dijberî pozî tîfê.*

**Negihîner** / Yalitkan / Isolator::Dielectric::Nonconductor::Nonconductive  
*Madeyê ku tezûya elektrîkê tê de derbas nabe. Mînak: Plastik, Dep*

**Negirêdayî** / Bağlantısız::Hattan kopuk / Offline  
*Qutbûna ji xeta komunîkasyonê. Di komunîkasyonê de qutbûna ragihînê*

**Neh** / Dokuz / Nine  
*Hejmara e. Hejmara piştî heştan. Navê hejmara 9 e. Di jimareya Romayî de IX.*

**Nehevyeke::Nehemcure::Heterojen / Heterojen / Heterogeneous**  
*Têkela ku li hemû derên xwe ji aliyê rêjeyê ve xwedî taybetmendiyên cuda ye. Dijberî homojenê.*

**Nekûr** / Sığ / Shallow  
*Kûrahiya hindik.*

**Nelihevkirî::Hevnegir / Uyumsuz / Discordant**  
*Madeyên ku bi hev re nayên kelijandin. Madeyên taybetmendiyên wan li dijî hev in. Mînak: hesin û bafûn, av û rûn*

**Neodînyûm** / Neodymium / Neodymium  
*Elementeke ku hejmara wê ya atomê 60 e.*

**Nepixî** / Şişkin / Puffy  
*Tîstêkî ku ji qewara xwe zêdetir werimêbe*

**Nepoxa Dazefînê** / Damıtma balonu / Distillation flask  
*Amûrek kîmyayê ye ku şilek tê de tê kelandin û piştê dukel (hilm) ê jî sar dike û dike şilek.*

**Nepoxa Piledar** / Balonjoje:Ölçü balonu / Volumetric flask  
*Amûrekê pişkî nîngehî ye, zêdetir ji bo pişkî nînen zîz (hessas) tê bikaranîn.*

**Neptun / Neptün / Neptune**  
*Gerstêrkek. Li gorî nêzbûna rojê gerstêrka rêza heştêmîn.*

**Nêr** / Eril / Male  
*Mêr. Di hin zimanan de peyva ku ji zayenda mêr tê hesabandin.*

**Nêrdewan::Pêlikan::Paçîne::Derence::Sêlim::Pêltûk / Merdiven / Staircase**  
*Rêza pêlekan a ji bo mirov derkeve jor an dakeve jêr.*

**Nêrer::Pêlweşên::Dezgayê nardinê / Verici / Transmitter**  
*Amûra ku bi alîkariya pêlên elektromagnetîk belavkirina deng, nîşan an jî wêne dike.*

**Nêrî** / Erkek keç / Billy goat  
*Bizina nêr.*

**Nêrîn** / Nezaret / Inspection  
*Kontrol kirina kargeha an jî karkeran e.*

**Nerm** / Yumuşak / Soft  
*1. Ne hişk, ter 2. Ne zivir "Bitirse ji germa germ û mirovê nerm." 3. Ne req, "Balguh nerm e lê kevir na."*

**Nermalav::Nivisbarî / Yazılım / Software**  
*Ji bo tevahiya pêdiviyên xebata kompîturê yên wek program, belge, dokuman an jî tevan tê gotin.*

**Nêrtarker** / Nötrale edici / Neutralizer  
*1 - A ku ji aliyê enerjîyê ve bar dike sifir. Madeya ku nakeve nava reaksiyona kîmyasal.*

**Nexşe** / Harita / Map  
*Xêzkirina teşeyê rûyê erdê ya li ser kaxizekî.*

**Nexşeger::Kartograf / Haritacı / Cartographer**  
*Kesê ku karên nexşegeriyê de dixebite û nexşeyê çêdike.*

**Nexşekarî::Nexşedanerî / Haritaçılık / Map compilation**  
*Pîşekariya xêzkirina xerî teyan; nexşesazî.*

**Nexşeya analog** / Analog harita / Analog map  
*Nexşeya ne dîjîtal. Nexşeya ku li ser paf tayê hatiye xêzkirin.*

**Nexşeya bajêr** / Kent haritasi / City map

*Nexşeya ji bo navnîşanên bajêr an jî geştiyariyê tê çêkirin.*

**Nexşeya bikaranîna erdê** / Arazi kullanım haritası / Land use map

*Nexşeya ku bikaranîna erdê nîşan dide. Beşên erd bi çî armançê bêna bikaranîna di nexşeyê de tê nîşandan. "bajarvanî, çandîni, qada şênahiyê..."*

**Nexşeya binavî** / Batimetrik harita / Bathymetric map

*Nexşeya deverên av (gol, derya). Ev nexşe ne bilindahiyê tenê kûrahîyê nîşan dide.*

**Nexşeya dijîtal** / Digital harita:sayisal harita / Digital map

*Nexşeya ne analog an ku nehatiye xêzkirin û nivîsîn. Ev nexşe tenê ji hêmar û simbolan pêk tê û di kompîterê de tê hilanîn.*

**Nexşeya fizîkî** / Fiziki harita / Physical map

*Nexşeya ku çiya, deşt, robar, bilindahî, kurahî û hwd. nîşan dide.*

**Nexşeya kadastroyê** / Kadastro haritası / Cadastral map

*Nexşeya ku sînorê erd û xwediyê erd nîşan dide. Pîvanoka wan bi gelemperî 1/1000 û 1/5000 e.*

**Nexşeya nirxê** / Değer haritası / Value map

*Nexşeya ku ji bo qimeta (biha) erdê nîşandide hatiye çêkirin.*

**Nexşeya ortofoto** / Ortofoto harita / Orthophoto maps

*Nexşeya ku ji fotografên satelaytê yê erdê nîşandidin pêkhatiye.*

**Nexşeya rewşê** / Durum haritası / Situation map

*Nexşeya ku rewşa amade nîşan dide.*

**Nexşeya rojane** / Halihazir harita / Current map

*Nexşeya ku rewşa dîroka ku hatiye çêkirin nîşan dide. Nexşeya ku roja pîvanê çî hatibe dîtin wê nîşan dide.*

**Nexşeya siyasî** / Siyasi harita / Political map

*Nexşeya ku sînorên rêveberiyana (welat, bajar, qeza, herêm...) nîşan dide.*

**Nexşeya topografîk** / Topografik harita / Topographic maps

*Nexşeya ku çiya, deşt, robar, bilindahî, kûrahî... hwd. nîşan dide. Nexşeya sêrehend (x, y, z).*

**Nexşeya xwareyî:Nexşeya larî** / Eğim haritası / Gradient map

*Nexşeya ku ji bo meyîla erdê nîşandide hatiye çêkirin.*

**Nexşeya xwedîtiyê** / Mülkiyet haritası / Property map

*Nexşeya ku ji bo nîşandana xwedîtiya erdan hatiye çêkirin. Nexşeya kadastroyê.*

**Neyeksanî** / Eşitsizlik / Inequality

*Newekhevûyîna du yan jî zêdetir tiştan. Lênehatina tiştan.*

**Neyînî** / Olumsuz / Negative

1. *Tiştê ku bersiva wê na ye û ne erê ye; menfî*  
2. *Ramana ku aliyê nebûna tiştêkî diangêje.*

**Neynok** / Tırnak / Nail:Pawl

1. *Di mirov û gelek giyandaran de tebeqeya li serê tiliyan* 2. *Ciyên badayî yê amûrên wek çengelê.*

**Nêz:Nêzik** / Yakın / Close:Near

1. *Ne li dûr* 2. *Berdest.*

**Nêzikatî:Nêzikahî** / Yaklaşım / Approach

1. *Karê nêzîkbûnê* 2. *Şêweya nîrxandin û nêrîna karekî.*

**Nêzîkkirin** / Yakınlaştırmak / Zoom

1. *Anîna hindê* 2. *Kêmkirina mesafeyê.*

**Nêzkirin** / Yaklaştırmak / Closer

*Anîna du tiştan a ber bi hev ve.*

**Niftik:Derbik:Şiqat** / Kibrit / Match

*Amûra şewitandinê ya ji darîkên biçûk.*

**Nîgar:Nexş** / Desen / Pattern

*Ji bo dîtineke ciwankar hemû xêzên ku hatine çêkirin.*

**Niha:Êsta** / Şimdi / Now

1. *Ne berê ne jî paşê, ev dema ku tê de* 2. *Dema têdeyî*

**Nîkel** / Nikel / Nickel

*Elementeke ku hejmarê wê ya atomê 28 e.*

**Nîlûfer** / Nilüfer bitkisi / Nenuphar

*Riwekeke avî.*

**Nimreya giravê** / Ada numarası / Block number

*Hêjmara ku koma parselan nîşan dide. Weke her parselê hêjmarekî ji bo koma parselan (girav) jî heye. Di her komê de hêjmara parselê jî yekê dest pê dibe. Ji çepa jor dest pê dibe û berbayê tevgera saetê zêde dibe.*

**Nimûne** / Örnek:Malzeme örneği / Sample

*Mînak. Parçeyekî biçûkê ê madeyê ku ji bo te-*

*mamî fikir dide. (Ji vî parçeyê biçûk di der heqê madeyê de pir tişt tê famkirin.)*

**Nîrengî** / Nirengi / Triangulation

*Di nexşegeriyê de bo berisandina (hesibandin) dirêjahiyekê, bilindahiyekê an jî bo têgihîştina qoordî natekê bi rêbaza dabeşkirina sêberî pîvana qadê.*

**Nîrx:**Biha / Değer / Value

*Di derheqê nenasbar an jî guhêrbarekî de vegotina bi hejmarî.*

**Nîrxa Bakûr (Jor)** / Yukarı değer / Northing value

*Di nexşevaniyê de ji sê koordînatên (Z, Y, Z) koordînat X'ê. Y'ya matematîkê di nexşevaniyê de dibe X.*

**Nîrxa gerdûnî ya serdest** / Üstün evrensel değer / Outstanding universal value

*Yê/a ku bi nîrxê xwe ji dahatuya mirovan re tê veguhestin.*

**Nîrxa hemta (emsal)** / Emsal değer / Illustrative value

*Nîrxê ku li gor bazara derdora xwe hatiye destnîşankirin.*

**Nîrxa rastî** / Gerçek değer / Intrinsic value

*Encam an jî daneya ku xeletî, şaşî li ser tune be.*

**Nîrxa rojane** / Güncel değer / Current value

*Nîrxa heyî. Nîrxa îro.*

**Nîrxa rojhelat (Rast)** / Sağa değer / Easting value

*Di nexşevaniyê de ji sê koordînatên (X, Y, Z) koordînat Y'yê. X'a matematîkê di nexşevaniyê de dibe Y.*

**Nîrxandin** / Değerlendirme / Evaluation

*Li gor taybetî û agahiyên hesapkirina buhayê mûlk (erd, xani...)*

**Nîrxandina bi bandora jîngehî** / Çevresel etki değerlendirme / Environmental impact assesment

*Li ber çavgirtina jîngehê ya plan û projeyê.*

**Nîrxandina cewherê** / Cevher değerlendirme / Benefaction of ore

*Pîvandina asta nîrxa cewheran. Xwerûkirin û dewlemendkirina cewheran.*

**Nîsk** / Mercimek / Lentil

*Riwekeke ku çandiniya wê tê kirin ji malbata baqilan e.*

**Nîşan bide** / Göster / Show

*Nîşandana tiştêkî yan jî kesekî.*

**Nîşan bike** / İşaretle / Mark

*Fermana nîşankirinê*

**Nîşandan** / Göstermek / Show

*1. Nimandin, ji kesekî re îşaretkirina tiştêkî 2. Pêşandan, rapêşandan \* "ji tunebûna şêran, rovî xwe nîşan didin wek guran"*

**Nîşandana xalê** / Yer gösterme / Application

*Cih nîşandana li ser erdê. Aplîkasyon.*

**Nîşander** / İbre / Pointer

*Di hin alavên pîvandinê de derziya ku rêje an jî hejmarê nîşan dide.*

**Nîşander::Endîkator** / Endikator::Gösterge / Indicator

*Amûra di derheqê xebata amerê (cîhaz) de bi ro-nahî yan jî di der heqê pîvaneke wê de agahiyê dide.*

**Nîşandera germahiyê** / Sıcaklık göstergesi / Temperature rise indicator

*Amûrek ku germahiyê û guherandina germahiyê ye dipîve.*

**Nîşaneya Erdhejê (Bûmelerzeyê)** / Deprem habercisi / Earthquake precursor

*Nîşanên ku di derbarê bûyîna erdhejê de agahiyê didin. Wek guherîna liv û tevgera av, hewa û qateka zemînê.*

**Nîşanker** / İmleç / Cursor

*Di kompîturê de bi kontrolkirina mişk (mouse) an jî klavyeyê tê livandin. Ciyê nivîsandin an jî cihê bê guhartin nîşan dide.*

**Nîşe::Not** / Not / Notice

*Nivîsa ku bi armanca bibîrxistinê tê nivîsandin.*

**Nîşter** / Neşter / Lancet

*Cureyêke kêrê ku ameliyat pê têne kirin.*

**Nîştî** / Çökel / Sediment

*Neheliyên bin avê yên ku di encama firidîn û ji hev belavbûna zinaran de derdikevin holê.*

**Nîştî** / Tortu / Sediment

*Şilemeniya ku di navê de madeyên xerîb û jê girantir hene û di binê şilemeniyê de digihîjin hev û hişk dibin. Mînak: kevirê xîzê*

**Nîştînasî** / Sedimentoloji / Sedimentology

*Beşa zanyariyê ya ku di der barê neheliyên bin avê de lêkolînan dike.*

**Nîv::Nîwe::Nîvçe** / Yarı / Half

*Parçeyek ji du parçeyên wekhev ku yekbûniyê pêk tînin. Ji duduyan yeka tiştêkî.*

**Nîvelman** / Nivelman / Leveling

*Hesapkirina bilindahiyê an jî ferqa bilindahiyê ya di navbera du xalanda.*

**Nîvelmana geometrîk** / Geometrik nivelman / Geometric leveling

*Nîvelmana ku bi alava nîvovê tê kirin.*

**Nîvelmana rûbar** / Yüzey nivelmani / Surface leveling  
*Hesapkirina bilindahiyên xalên li ser rûerdê.*

**Nîvelmana trîgonometrîk** / Trigonometrik nivelman / Trigonometric leveling

*Nîvelmana ku bi alava teodolît an jî takeometre yê tê kirin.*

**Nîvend sîsmîk** / Sismik odak / Seismic focus  
*Cihê ku enerjîya erdhejê jê derdîkeve.*

**Nîvîsandin** / Yazma / Write

*Kirina karê nivîsê. Xebitandina daneyan li ser hev an jî bi navber li darhêla (nêvanga) daneyê yan jî li bîrekê (hişkê)*

**Nîvîsbariya azad::Nermalava azad** / Özgür yazılım / Free software

*Programên kompîturê ku ji bikaranîna her kesî re vekirî ne. Programên bêbedel, bêbuha.*

**Nîvîskar** / Yazar / Author

*Kesên ku li ser zanist, huner, wêje hwd. pirtûkan dinivîse an jî amade dike. Bi taybetî kesên ku di rojname yan jî di kovaran de li ser mijarekê dinivîsin. Ji kesê/a ku nivîsbariya kompîturê nivîsandîye re jî tê gotin.*

**Nîvo** / Nivo / Engineer's level

*Alava ku pê ferqa bilindahiya di navberên du xalên erdê tê hesapkirin.*

**Nîvqada bakûr** / Kuzey yarım küre / Northern hemisphere

*Nîvbeşa cîhanê ya li jora (bakûr) xeta ekvatorê.*

**Nîvro** / Öğlen vakti / Noon

*Danekî ku tav di nîvêka esmên de xuya dibe û siya heyberan bi qasî cîsman dibe.*

**Nîv-temen** / Yarî-ömür / Half-life

*Bi tevahî, maddeyek ku ber bi kêm bûnê ve biçe û qasî nîvê temamiya maddeyê bikeve, li pedîviya vê dema derbaz dibe re tê gotin.*

**Nîvtîreya Atomê::Nîvêşkêla Atomê** / Atom yarıçapı / Atomic radius

*Çendaniyekeke dûrahiya di navbera dendika atomê û mîja elektronê nîşan dide*

**Niyaza qenc::Niyaza pak** / İyi niyet / Goodwill

*Di derbasbûna mafekî de nezanîna kêmasiyan.*

**Nîzama bi hev ve** / Bitişik nizam / Attached

*Avahiyên ku her du aliyê wan jî bi parsela cîranê xwe re bi hev ve ne.*

**Nîzama blokî** / Blok nizam / Detached

*Di planê de avahiya ku dirêjahî, bilindahî û kêrahiya wê diyar e. Li ser yek, du yan jî sê parselan tê avakirin.*

**Nîzamê biloqî** / Blok nizam / Detached block

*Di planê de avahiya ku dirêjahî, bilindahî û kêrahiya wê diyar e. Li ser yek, du yan jî sê parselan tê çêkirin.*

**Nîzamê cudayî** / Ayrık nizam / Separate buildings

*Xaniyê ku bi hemû aliyên xwe ve ji xaniyên cîran veqetandî.*

**Nîzm** / Alçak / Low

*Bilindahiya kêma li gora referansekê. "Çiyayê Cûdî ji Çiyayê Agirî nizimtir e." Ji bo hemû zemînan tê gotin. "Xaniyê yekta ji xaniyê duta nizimtir e."*

**Nîzmbûyîna** / Xala Qerisînê / Donma noktası alçalması / Cryoscopy

*Heke madde belûrî û xwerû be, di germahiyekê pendî de şilaviya xwe berdide û hişk dibe, li wî germahiyê re nizmiya xala qerisînê tê gotin.*

**Nîzmî** / Basklık / Kurtosis

*Rewşa ne bilind. Bilindahiya kêma.*

**Nobelyûm** / Nobelyum / Nobelium

*Elementa ku bi amerîkyûm û kuryûmê li labaratorê hatîye çêkirin.*

**Nod** / Doksan / Ninty

*Hejmara piştî heştê û nehan. Navê hejmara 90'î, an jî di jimareya Romayî de xc.*

**Nogin** / Düve (genç ve doğurmamış inek) / Largest of the calf

*Çêleka ku hîna nezaye.*

**Nok** / Nohut / Chickpea

*Riwekeke ku çandiniya wê tê kirin, ji malbata baqilan e.*

**Noqbûn** / Suya dalma / Diving

*Tîştêkî ku li ser avê be û bikeve binê avê.*

**Noqbûn::Binavbûn** / *Batma::Batış (geminin batması) / Stinging::Sink (sinking ship)*  
Ketina binê avê.

**Noqkirin** / Daldırma / Immersion  
*Hedimandina (çehlkirina) heyberekî di nava şilek an jî madeyeke nerm de. Ji bo muameleyê (kîrarê) xistina parçeyekî ya nava şilekekî. Binavkirin.*

**Normalîte::Asayî** / Normalite / Normality  
*Hejmara maddeyekê gramî ya hevbuha ye, ev jîmare gava maddeyek di nava lîtrekê gîravê de bihele pêk tê.*

**Nozdeh** / Ondokuz / Nineteen  
*Hejmara piştî hijdehan. Navê hejmara 19'an, an jî di jimareya Romayî de ıxx.*

**Nûbûn** / Yenileşmek / Become new  
*Wergirtina şêweyekî nû, guncîna rewşeke nû, teze bûn.*

**Nûjenkirin::Venûkirin** / Güncelleme / Update  
*Nûjenkirina rewşê, wezîyetê. Derxistina heman bernameyî bi rewşeke nûtir. Rewaca programan bi nivîsbariya herî dawîn.*

**Nûketin** / Üye ol:kaydol / Sign up  
*Xwe lê zêdekirina endamên malperê. Yekem car endambûyîna malperekê. Di malperê de ji bo ku kes bibin endam ew bişkoka ku tê tikandin.*

**Nûkirin** / Yenileme / Renovation  
*Piştî derbasbûna demên dirêj an jî destnîşankirina xeletiyên mezin ji nû ve çêkirina qadas-troyê.*

**Nutron** / Nötron / Neutron  
*Hebikên atomê ku her yek giraniya wan nezî protonê û barê wan ê elektrîkê tune ye.*



**Oksîjen** / Oksijen / Oxygen

*Elementa ku giyaneweran zindî dihêle. Bi şewata wê em enerjîyê serf dikin.*

**Onîks** / Oniks / Onyx

*Mermera ku êdî qedemeya veguherîna wê nemaye.*

**Optîk::Bînayî** / Optik / Optical

*1. Tiştê ku bi dîtinê re eleqedar e. 2. Beşa fizîkê ya ku li ser mijarên roniyê hûr dibe.*

**Organîk / Organik / Organic**

*Heyberên ku parçeyek ji zindiyan e an jî ji zindiyên çêbûye.*

**Organîzma::Zîndewer** / Organizma / Organism

*Tevahiya lebatên ku giyandarekê/î pêk tînin, uz-wiyet.*

**Orkîde** / Orkide / Orchid

*Riwekeke xwezayî ye, ji toven wê salep tê çêkirin.*

**Oşîlatora bêaheng** / Uyumsuz salıncı / Anharmonic oscillator

*Amûra ku bê aheng û bi dor herikîna alternatîf çêdike.*

**Osmoz** / Osmoz / Osmosis

*Dufuziyona avê.*

**Oto** / Oto / Auto

*1. Otomobîl 2. Amûrên ku bi rêyên mekanîk tîn tevgerandî û xwe bi xwe bi rê ve dibin.*

**Otomasyon::Xodkarî** / Otomasyon / Automation

*Karê ku bêyî alîkariya mirov, bi alîkariya makîneyan xwe bi xwe tê kirin.*

**Otomatîk::Xodkar** / Otomatik / Automatic

*Amûra ku bi rêyên mekanîk dilive, xwe bi xwe (xweserî) bi rê ve dibe.*

**Ozon** / Ozon / Ozone

*Elementa ji oksîjenê ya ku di molekula wê de 3 atom cî digirin*



# { P }

**Pace::Şibak::Pencere** / Pencere / Window  
*Beşa vekirî ya di avahî yan jî makîneyan de ji bo ronahî û danûstendina hewayê.*

**Pafte** / Pafta / Sheet  
*Parçeyek ji nexşeyê. Ji bo bikaranina nexşeyên qadên fîreh hêsantirbe nexşe tîn parçekirin, ji her parçeyê re pafte tê gotin. Her pafte bi pîranî qasî 60x80 cm. e.*

**Pafteya astralon** / Astralon pafta / Astralone map sheet  
*Pafteyên ku li ser astralonan hatiye xêzkirin. Di astralonan de piştî salên dirêj jî xerabûn pir kême.*

**Pafteya giravê** / Ada paftası / Blok type map  
*Pafteya ku komên parselan (girav) nîşan dide.*

**Pafteya karton** / Karton pafta / Cardboard sheet  
*Nexşeyên ku li ser kartonan (kaxizên situr) hatiye çêkirin. Pafte beşek nexşeyê ye.*

**Pafteya tije** / Dolu pafta / Frame sheet  
*Di pafteyande kêmtirîn valahî hiştin. Ji bo bi hêsani bê bikaranîn, nexşe li pafteyan wusa tê parvekirin ku heri kême pafte jê derkevin.*

**Paket::Pêçek** / Paket / Packet  
*Objeya di navê de tiştê an tiştin bi destan bîn hilgirtin; bi kaxez hatiye dorpêçkirin, an jî di nava qutiyê de hatiye girêdan.*

**Paladyûm** / Paladyum / Palladium  
*Elementek e ku hejmara wê ya atomê 46 e. Di-şibe platînê.*

**Palan::kurtan / Semer / Saddle / Cilên heywanên bargir.**

**Palavk::Filtre::Parzûn** / Filtre / Filter::Strainer  
*Cureyekî safokê ye. Tiştê ku tiştên nayên xwestin jê derbas nabin.*

**Paldank::Pişte** / Dayanak / Support  
*1. Kursî, sendelî 2. Pişte, palpişt, balîf 3. Sparte, destek.*

**Pale::Êlxat::Wertzvan::Sepan::Karker::Karkerên çandiniyê** / Irgat / Laborer  
*Xebatkarên çandiniyê.*

**Palet** / Palet / Caterpillar  
*Di maşîneyan de, ji bo qada herî û bi berf an nêzikî wan tê xebitandin.*

**Palpiştiya hişk** / Esnemez destek::rijit tahkimat / Rigid support  
*Desteka ku di kolana tunelê de ji bo tunel hilne-weşe.*

**Pankirin::Rastkirin** / Düzleştirme / Flatten  
*1. Tekûzkirin, rastkirina ruyê tiştêkî 2. Sererastkirin.*

**Pano** / Pano / Panel  
*Paceya ku amêrên kontrolê tê de tîn bicîkirin. Ji bo kontrolkirina pergala elektrîkî yan jî kontrolkirina makîneyan tê bikaranîn.*

**Paqijker** / Temizleyici / Cleaner  
*1 - Programa ku bîra (hiş) kompîturê vala dike. 2 - Kes an jî objeya ku paqijiyê dike.*

**Paqijkirin** / Temizleme / Cleaning

*Valakirina, sifirkirina daneyê di nav bîra (hiş) kompîtur an jî makîneyê de didome.*

**Par** / Geçen yıl / Last year

*Sala ku derbas bû, qediya. Sala çûyî.*

**Par::Beş::Encam** / Bölüm (bölme işleminde bölüm) / Quotient

*Hejmara ku di dawiya kirariya dabeşînê de dertê.*

**Para erseyê** / Arsa payi / Ownership share

*Di parselekê de di Xwedîtiya ji yekê zêde de para her yekî. Avahiyên li ser heman parselê li gor mezinbûnê xwediyê parek ji parselê (erse) ye.*

**Para terkîn a verastkirinê** / Düzenleme ortaklık payi / Development readjustment share

*Li gor zagona îmarê ji her xwediyê eraseyan parek diyar tê birîn.*

**Parabol::Birgeya hevta** / Parabol / Parabola

*Cihê xalên ku dûrahiya wan ji xala nîvend (focus) û xêza rastkirî (directrix) re yeksan e.*

**Parabolîk::Birgeya hevtayî** / Parabolik / Parabolic

*Tiştên bi parabolê ve têkildar, parabolê ve girêdayî.*

**Paraboloîf** / Paraboloid / Paraboloid

*"Paraboloîfa elîptîk, paraboloîfa hîperbolîk."*

**Paradoks::Hevdiji::Dijgeyî** / Paradoks / Paradox

*1. Fikir an jî rewşên lihevnehatî. 2. Fikreke nelirê, çeprast 3. Dijraber.*

**Parametre** / Parametre / Parameter

*Guhêrbare ku bandor û têkiliya li ser tiştekî nîşan dide.*

**Parastin** / Koruma / Protection

*Di elektrîkê de li hemberî arîze û di karê elektrîkê de li hemberî kirina şaşiye xebatkar, ji bo zîyanê kêmkirî, parastina jiyana mirov, candar û parastina xerabûna amûran. "Parastina van amûrên (cîhaz) nû tev di nav xwe de çêkirine."*

**Parastin** / Savunmak / Defend

*1. Berevanîkirin, ji xetere û bandorên neyînî dûrhiştina tiştekî yan jî kesekî. 2. Hemet kirin \* "Gund, bê se nayê parastin."*

**Parastina lêjî** / Şev korunması / Slope protection

*Zeximkirina lêjiyê. Pêşîlêgirtina ramalînê. Mînak;*

*Di bendavê de rûyê aliyê avê bi kevirên gewre tê zeximandin. Dîwarên li kêleka rê ku ji bo pêşîgirtina hilweşîna axê têne çêkirin.*

**Parçe::Pêkhate** / Parça / Component

*Tiştê ji yekbûniyê qetiyayî, bi tenê tê jimartin an jî ji yekbûniyê zêde maye. Her yek ji tiştê hêsan ku yekbûniyê ava dikin. "Hejmara parçeyên vê komê çend in?" "Di nava cilên min de çend parçeyên xweşik hene."*

**Parçebûn** / Parçalanma / Fragmentation

*Hûrbûn û ji hev veqetîna madeyan.*

**Parçekirina zêviyê (erd)** / Arazi parçalanması / Fragmentation

*Ji parselekê derxistina du an jî duduyan zêdetir parsel. Biçûk kirina parselan.*

**Parçik::Partîkul** / Parçacık / Partial

*parçeye herî piçuk*

**Pardar** / Hissedar / Shareholder

*Kesê/a ku xwedî par e.*

**Parêz::Bostan** / Bostan tarlası / Melons field

*Baxê hêşînahiyê.*

**Park** / Park / Park

*Baxçeyên mezin ên bi dar û şînayî ku di nav bajar de ji bo gel lê bigere û behna xwe bide hatine avakirin.*

**Parka herêmî** / Bölge parkı / Regional park

*Parka mezin ku ji bo xizmeta herêmekê hatiye çêkirin.*

**Parsela avadaniyê (îmarê)** / İmar parseli / Development parcels

*Parsela ku li gor parselasyona plana avadaniyê (îmarê) hatiye çêkirin.*

**Parsela kadastroyê** / Kadastro parseli / Cadastral parcels

*Parsela ku li gor xebata kadastroyê hatiye çêkirin.*

**Parsêla zeviyê (erd)** / Arazi parseli / Land parcel

*Parsela kadastroyê (zevî). Eger parsel li gor plana îmarê çêbibe, wê demê navê zeviyê dibe erse.*

**Parselasyon** / Parselasyon / Parcelling

*Li gor planê îmarê an jî li gor xwestekê ji parselek derxistina çend parselan. Parçekirina parselan.*

**Paş / Geri / Rear:**Back

1. Pişt 2. Dawî.

**Paş / Geri:**Önceki / Back

Xebitandina di programên kompîturê de xebata beriya niha. Dijberî "pêş". "Ew agahiyên ku em lê digerin di malpêrê de di rûpela paş de bûn."

**Paşdahîştî::Derenghiştî::Vehîştî /** Geciktirilmiş göçertme yöntemi / Retarded

Rêbaza ku ji bo derxistina cewherê pêşîgirtina herivandina axê.

**Paşerokên radyoaktîf::Avêtîyên radyoaktîf /**

Nükleer atık / Radioactivewaste

Ji bermahiyên ku piştî karê nuklerî dimînin.

**Paşketin / Gerileme / Recessional**

1. Karê paşveçûyîne 2. Lawaz bûn, kêmbûn.

**Paşlerze / Artqî sarsıntı / Aftershock**

Hejînen zemîne yê bê pergal ku li dû erdheja mezin pêk tên.

**Patent / Buluş belgesi / Patent**

Belgeya (dokumana) kifşê. Belgeya vedîtina tiştekî nû. Belgeya di bin parastina qanûnê de ji bo kifşa proses, amûr an jî metodeke nû, ji aliyê ofîsa patentê ve tê dayîn.

**Pazdeh / On beş / Fifteen**

Hejmara piştî çardehan. Navê hejmara 15'an, an jî di jimareya Roma'yî de xv.

**Pêçan::Lefandin::Dorzivîn /** Sarmak / Wrap

1. Paçikirin 2. Lêalandin 3. Dorlêgirtin.

**Pêgirî / Bağımlılık / Dependence**

Nirxeke ku li gora guherbarekî nixr diguherîne

**Pehnî / Topuk / Heel:Toe**

1. Paşiya pêlavê 2. Dawiya solê.

**Pêjgîr / Havlu / Towel**

Paçê ziwakirinê.

**Pejnerkî::Peljenî / Duyarlılık / Precision**

Rastîbiniya daneyê ye.

**Pêkhata şespalûya girtî /** Sıkıdılmış altıgensel

yapı / Close packed hexagonal structure

Şeşgoşeya rast ku xwedî bilindahî ye û 3 rehend e. Ser û binê wê şeşgoşe ye, dora wê jî bi çargoşeyan pêçayî ye.

**Pêkhate / Bileşen / Constituent**

Gelê madeyên xamên ku di nava madeyên tevli-

evî an pêkhatî ne.

**Pêkhate:Hêman /** Yapıtışı / Constituent

Parçeyek ji parçeyên hemû.

**Pêkhateya kevirî::Pêkhateya berdî /** Kayaç yapısı / Rock structure

Cure û taybetmendiyên kevir an jî keviriyên.

**Pêkhateya Lewisî /** Lewis yapısı / Lewis structure

Curekek formulên kîmyewî ku li dora sembola elementê elektron bi xalan têne nîşandan.

**Pêkhateyên sereke /** Mütemmim cüz / Essential component

Pêkhateya bi hev ve girêdayî. Ev pêkhate ji eslê xwe nayê veqetandin. Bi eslê xwe ve dijî. Bê veqetandin ji taybetiya xwe wenda dike. Xanî mutemîn cüz a parselê ye, dar mutemîn cüz a baxçeyê ye.

**Pêkhatin::Çêbûn /** Oluşmak / Occur

Bûyîna heyberê. Derketina holê.

**Pêkhêrandin /** Bileştirmek / Compose (to)

Li nav hev xistin.

**Pekîn /** Sekme / Rebound

Bi sedema lêketina heyberê bertek çêdibe û ew heyber vedigere.

**Pêl /** Dalga / Wave

Di fizîkê de lerza ku belav dibe û bi xwe re enerjîyê radigihîne.

**Pêlav::Sol /** Pabuç:Ayakbabi / Shoe

Amûra lixwekirin û parastina lîngan ku bi piranî li derveyî malê tê bikaranîn.

**Pêlbir::Pêşikên /** Dalgakiran / Jetty

Dîwarê di nava deryayê de nêzî peravê ye, ji bo kêmkirina bandora (hêz) pêlên avê.

**Pelçimhewêz::Pelhewêz /** Sinir otu / Plantago sp

Giyayek e di hekîmiyê de tê bikaranîn.

**Pelçiqandin::Pelixandin /** Ezmek / Crush

Bi alîkariya hêzekê tişt şeweyê xwe diguherînin. Dema mirov pê li fêkiyekê bike fêkî şeweyê xwe diguherîne, diqelîşe û ava nava xwe derdixe, ev pelçiqandin e.

**Pelê mêwê /** Asma yaprağı / Grape leaves

Pelên dara tirî.

**Pelê silkê /** Pazı yaprağı / Leaf beet

Pelên giyayê silkê ku ji familyeya ispanaxê ye.

**Pêlên erdhejê** / Deprem dalgaları / Earthquake waves  
*Di dema erdhejê de ji navenda erdhejê ber bi derve ve hêza heja zemînê.*

**Pêlên hertzî** /  $3 \times 10^4 - 1 : 5 \times 10^5$  hz aralığındaki dalgalar / Hertzian waves  
*Pêlên hertz bi navê zanyarê Alman Heinrich Hertz hatiye binavkirin. Pêlên hem elektrîk, hem manyetîk in ango elektromanyetîk in û bi leza ronahiyê li hewayê belav dibin. Frekansên wan di navbera  $3 \times 10^{10} - 1, 5 \times 10^5$  hz (dirêjîya pêlan di navbera 2 cm - 2.000 m) de ye.*

**Pelîn** / Yapraksı / Foliated  
*Tiştê ku wek pel xuya dike.*

**Peljenî** / Doğruluk / Accuracy  
*Di pîvanan de heta radeyekî xeletî, şaşî tê qebûlîkirin. Radeya rastiya pîvanê ye.*

**Pêlweş** / Dalga yayıcı / Radiator  
*1-Amûra ku hewa, av an jî hîlma germkirî yan jî sarkirî belav dike û bi vî awayî germahî yan jî hênîkahiyê çêdike. 2-Sarkera ku zêdebûna pîleya germa motora ku bi xwe ve girêdayî ye dixîne.*

**Pembû** / Pamuk / Cotton  
*Riwekeke ku berên wê spî ne, dişibin hiriyê, nerm e. Di tekstîlê de yek ji madeyên xam e, pê cil çêdibin.*

**Pênc** / Beş / Five  
*Hejmara piştî çaran. Navê hejmara 5'an, an jî di jimareya Romayî de v.*

**Pênc sed** / Beş yüz / Five hundred  
*Hejmara piştî çarsed nod û nehan. Pênc car sed. Navê hejmara 500'î, an jî di jimareya Romayî de d.*

**Pêncî** / Elli / Fifty  
*Hejmara piştî çil û nehan. Navê hejmara 50'yî, an jî di jimareya Romayî de l.*

**Pênûs::Qelem** / Kalem / Pen::Pencil  
*Amûra nivîsînê.*

**Pêpelûk::Pêlik::Pêngav** / Basamak / Step  
*1. Di derencê de rûyê ku ling pê lê dike. 2. Ji bo derketina çiyekî bilind çihê ku mirov piyên xwe datîninê, her yek ji wan bi bilindîya 17 cm'yan tê çêkirin.*

**Peqik** / Kabarcık / Bubble  
*Tiştên ku hundirê wî wê bi av an hewayê bine-pixe. Dema ku çermê mirov dişewite û çerm dine-*

*pixe re jî tê gotin.*

**Peqika asokerê** / Düzec kabarcığı / Bubble  
*Nîşaneke li ser asokerê.*

**Per::Bask::Çeng** / Kanat / Wing  
*1. Lebatê firindeyan ê ku pê perwaz digirin; per  
 2. Çepil, mil \*” Her teyr bi baskên xwe difire.”*

**Pêrar** / İki yıl önce:Evelki yıl  
*Two years ago / Du sal berê.*

**Peravxanî** / Yalı / Mansion  
*Koşkên li kêleka avan. Xaniyên taybet yê beravan.*

**Perde** / Ekran / Screen  
*Amûra rûxara wê rast û ne zebloq ku bi alîkariya (rêya) ronahiyê wêne yan jî vîdeoyan nîşan dide.*

**Pere::Dirav** / Para / Money  
*Amûra dayînê ku ji kaxiz an jî ji metal hatiye çêkirin.*

**Performans** / Performans / Performance  
*Rewşa xurtaniya di derbarê karekî de.*

**Pergal::Sîstem** / Sistem / System  
*Tevahiya rêbazên ku bi kêra bidestxistina encamê tên.*

**Pergala agahiyê ya zeviyê** / Arazi bilgi sistemi / Land information system  
*Sistema agahiyê ya ku agahiyên derheqê erd têde tên komkirin.*

**Pergala metreyî::Sîstema metrî** / Metrik sistem / Metric system  
*Di matematîkê de pîvanekên pergala metreyê.*

**Perkaz::perwaz** / Pervaz / Molding:Moulding  
*Perçeyek kêmbêr ku li dora şîbak an jî deriyên têxistin.*

**Perperok::îfîdok::Pinpinîk** / Kelebek / Butterfly  
*Kêzikeke ku temenê wê gelekî kin e.*

**Perwane** / Pervane / Propeller  
*Pirî çaran seba sarkirin û tevgerdayînê tê xebitandin.*

**Perwerde** / Eğitim / Education  
*Karê hînkirin û fêrîkirinê.*

**Pestan** / Basınç / Pressure  
*Mêjera hêza stûnî ya ku li yekeya qadê bandor dike.*

**Pestîn::Pestîner** / Pres: Baskı / Press

1. *Şîdanîna heyberêkê di nava du hêz an jî metalan de.* 2. *Makîneya ku karê presê dike.*

**Pestoya Beşkî::Beşepestan** / Kısmi basınç / Partial pressure

*Li gazên di nava têkelek gaza mengî de her gazekê pestoyekê xwe a beşkî heye. her gazek jî bilîf têkelê li gorî vî pestoya beşkî dihele. Di derdan (aman) a ku gazên ji hev cuda dixewîne de pestoya ku gor qebareya gazan para wan e.*

**Pestoya bilind** / Yüksek basınç / High pressure :: Overpressure

*Pestana ku ji hududê dawîniya maşînan zedetir e.*

**Pestoya Dûkelê** / Buhar basıncı / Vapor pressure  
